

Kurdish Peyama

Rojnameya Giştî ya Hefteyî

Hejmar 18 / Sal 1

07.01.2005

Kurdish weekly newspaper

Kurdische Wochenzeitung

Birînek kûrr ji bo mirovayetiye

Li welatên Asya başûr, ji ber erdheja li Okyanûsa Pasîfîk nêzîkî du sed hezar însan çûn ser dilovaniya xwe. Du milyonî zêdetir kes jî bê mal û kar, kel û pel



man. Em vê kerasetê û qurbanîyên wê bi birtînin. Alîkariyeke piçûk dikare birînekî bikewîne. Tevlî kampan-yan bin, alîkarî bikin. Ev wateyê ke însanî û pîroz e!

Êdî jinên Kurdistanê jî di siyaseta de bihêz in!



Rûpel 4

Wezîrê Eşo

Radyoya Êrîvanê û xebata wê

Rûpel 14

Cagiroteyî wezirî karanî teber ê Amerîka Kurdistan zîyaret kerd

Rûpel 16

Umit Firat

Lê bi başî û kêmasiya xwe ve em karin bêjin du daxuyanî biserketiye

Rûpel 9

Arjen Arî û Mihemed Bîlan "Kurd dikarin festêvalên baştir çêkin"

Rûpel 15

Bersîva testa evîne bidin!



Rûpel 12

Baskek ji rêvebir û siyasetvanên Tirk doza dagirkirina Mûsilê dikan

Xewnên Îttîhat-Terakiyan û Kemalîstan

Mûsil, di dema Împaratoriya osmanî de wek Bexda û Besra wîlayeteke xweser bû. Hin birêvebirên Tirk hêj xwe wek Paşayên Osmanî dihesibînin û xewnên destxistina Mûsil û Kerkûkê dibînin. Lê Dewleta Tirk berî 79 salan roja 05.01.1926 de Mûsil teslîmî Îngîlîzan kir.

Serokwezîrê kevn yê Tirkiyê Bülent Ecevit derketiye ortê û behsa dagirkirina Mûsilê û Kurdistanê dike. Ew dibêje: "İsmet İnönü di derbarê kêşeya Mûsilê de wesiyetnameyek li min kiribû" Ecevit nêrînen xwe û van agahdariyan gihandiye Serokkomarê Tirkiyê. Li gor nêrînen pisporan, helwesta Ecevit ne bi serê xwe ye. Ew nûneriya nêt û nêrînen baskekî şovenist di nav dewleta Tirk de dike.

Serokwezîrê kevn yê Tirkiyê Bülent Ecevit carek din û bi israr dubare dike û dibêje ku divê Dewleta Tirk Kurdistanê Başûr dagir bike. Li gora Ecevit ger Tirkiyê Kurdistanê dagir neke wê Kurdistan Tirkiyê dagir bike. Ger mirov wê axaftina Ecevit, ku ev du hefteye her tîne ser zimên û dixwe rojevaya Tirkiyê, tenê bi wî ve girê bide dikare piştguh bike û



Rûpel 3

ciddî negire. Lê gava mirov bala xwe dide ser diplomasi û pêwendiyên di navbera Tirkiyê, Îran û Sûriyê de,

ku ev demeke ji pêwistiya xwe bêtir germ bûye rewş diguhere.

Ji bo Federasyonê ji Amedê 260 îmze

Li Amedê 260 kesan înzeya xwe avêtin binê Îlana Parisê û bi daxuyanîyek çapemeniyê ragihandin

Amed - Li Amedê 260 kesan înzeya xwe avêtin binê Îlana Parisê û bi daxuyanîyek çapemeniyê ragihandin ku ew, dozvekirina di derbarê înzekaran de şermezar dikan û wê helwestê li pêşiya maf û azadiyan, weke kelem dibînin.

Guçlu daxuyanîyek da Peyama Kurd û wiha got: Weke tê zanîn îlana ku bi pêşengiya Enstîtuya Kurdî ya Parisê hate amade kirin, dengê mezîna da û hişt ku tevayê siyasetmedar û çapemeniya Tirk bi yek dengî êrişê bibin ser amadekar û înzekarên îlanê.

Di derbarê wê mijarê de Îbrahîm

Rûpel 3

Li Hewlêrê êrişa leşkerên Amerîkî hat protesto kirin

Di derbarê êrişa li Hewlêrê de peyamnêrê Peyama Kurd ragihand ku berî teqînê, dezgehên Amerîkî yê istixbaratê li Kurdistanê çavderiya hinek cihan kirine, û gumanên wan çêbûne ku grûbek terorîst li wan derdoran di nava hewldanên çalakiyan de ye

Rûpel 3

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



Kadîm Kan	İsmail Umer	Hediye Dag	Selîm Mûrad
Dewletên Erebb û Tirk dijberên xwe...	Divê Pirsê Kurdî ...	Sala 2004an sala vîrûsan bû	Hîşar Agaoglu
Rûpel 4	Rûpel 7	Rûpel 8	Rûpel 17

Rê û vîzyona li pêşiya gelê Kurd, ne ya salekî ye, bi kêmasî ya bîst salan e!

Bayram Ayaz

Ji adetê ye, her sersalê hemî kes û hêz hesab û kitabê xwe dikin.

Gelo sala bihûrî çî kar û zerara me çêbû? Sala pêş armancên me çî ne û emê çawa xwe bigihînin armancên xwe? Dewlet jî, sazî û dezgeh jî vî hesabî dikin û yek bi yek insan jî.

Ji bo ku mirov bikare hesabê xwe rast bike, divê armancên mirov zelal hebin. Wê demê mirov dikare destkeftiyên xwe rast binase û diyar bike, her wisa zerar û ziyana xwe jî.

Armanca sereke ya miletê Kurd çî ye? Li ser axa bav û kalan (li Kurdistanê) mafê çarenûsî bi dest bixe û bibe xwedî desthilatdarî û dewlet. Ev armanc ya her Kurdekî/a welatperwer û neteweperwer e.

Di vî çarçoveyê de, em dikarin bêjin ku li başûrê welatê me, doza miletê me gihaye qonaxê pêş û di prosesa damezirandina dewleteka demokrat û netewî de ye. Li perçeyên welatê me din de, gelê Kurd xebata destxistina azadiya xwe didomîne. Ser bingehê mafê çarenûsî (self determination) daxwazên maf û azadiyan û xwe bi xwe îdarekirinê dike. Ev daxwaz li rojhilatê Kurdistanê wek çareseriyekê federalî tê pêşkêşkirin. Li bakurê Kurdistanê jî armanca ser axa Kurdistanê mafê xwe bi xwe îdarekirinê her diçe xurt dibe, daxwaza çareseriyekê federalî tê kirin. Li binêxetê maf û azadiyên siyasî û çandî tî xwestin.

Baş e, di vî armanca xwe de me çî bi dest xist û zerar û ziyana me çî ye? Kijan bûyer di vî rê de zêdetir tîkoşîna xelkê Kurdistanê xurt kir?

Ya min, yekser Peymana Selehedînê tê bîra min. Ji bo min di sala 2004 an de ji

vê mizgînî û diyariyê giringtir tu karekî din tune.

Peymana ku di nabeyna Partiyê û Yekîtiyê de hat îmzekirin, gava herî giring e di van deh salên dawî de di dîroka Kurd û Kurdistanê de. Ji bo çî wisa ye? Jiber ku bi vî Peymanê miletê Kurd û xelkên başûrê Kurdistanê siyasîyên derbasê qonaxê nu bûn û gavêkî ditir nêzîkî dewleta Kurdistanê bûn. Ev peyman Kurdan wisa xurt dike, ku di her du opsiyonên siyasî mûmkîn de jî dewleta Kurdistanê dê ji rewşa de facto derbasî statûyê huqûqî bibe, ango dê goreyê huqûqa navdewlî statûyê rewa werbigre.

Ev du rê kîjan in?

Yek jê, ser bingehê parastina yekîtiya dewleta Iraqê, li ser axa Kurdistanê realizekirina Dewleteka federe ya Kurdistanê ku dê şirikê desthilatdariya li Bexdayê be jî. Dinya û Amerîkî îro bêtir vî opsiyonê dixwazin. Ev opsiyon li Projeya Mezin ya Rojhilata Navîn tê. Armanca vî projeyê demokratîzekirina heremê ye. Hemî hêz dibînin ku tevgera Kurd pêşengê tîkoşîna demokratîyê ye. Bê Kurdan li Iraqê pêkanîna civakê sivil û desthilatdariyê demokratîk gelekî zehmet e.

Tevgera Kurd li başûrê welatê me politikayê realist dimeşîne û vî opsiyonê red nake. Lê bi şertê ku tevgera Kurd li seranserê başûrê Kurdistanê (li Kerkûkê, Mûsilê, Xaneqînê û deverên din jî) desthilatdariya xwe bi cih û bihêz bike û ev dever jî bi temamî bikevin bin kontrola Dewleta Kurdistanê. Ev noqteyê sereke ye. Vêca Peymana Selehedînê dihêle ku tevgera Kurd jî yek du piştrast bin û xwe li dora siyaseteke

hevbeş neteweyî bicivînin. Bê guman ev peyman hêza Kurdan beramberê Ereban û Dewletên cîran jî xurt dike.

Eger ku cihgirê wezîrê derve yê Amerîkayê Richard L. Armitage bi fermî dibêje, em piştigiriya daxwaza Kurdan ya tetbîqkirina xala 58an dikin, pêwîst e em bizanin ev encameka Peymana Selehedînê ye. Eger Kurdan gotina xwe nekiriba yek Amerîkîyan vî helwestê wisa bi aşkere diyar nedikir.

Wisa diyar e, tevgera Kurd li başûrê welatê me dê ser vî opsiyonê hêz gelek raweste. Û di ser vî riyê de bigihîje armanca xwe sereke. Lê ev ne karekî salekî ye, belkî pênc sal, belkî deh sal bidome.

Opsiyoona din rîya dewleteke serbi-xwe ye. Helbet tevgera Kurd vî riyê jî ji bir nake û di ajanda wan ya siyasî de ev jî heye. Tevgera referandûmê û pêşkêşkirina daxwaza gelê Kurdistanê ji bo UN (Yekîtiya Miletan) karekî manîdar e. Lê ev opsiyon heta Amerîkî helwesta xwe neguhêrin û li dinyayê konjonkturê nu peyda nebe, wek opsi-yoneke dijwar xuya dike. Îro jî pênc endamên berdewamî yê Komîteya Parastinê ya UN sê ne li gel perçebûna Iraqê û îlankirina dewleta Kurdistanê ne. Rusya, Çîn û Franse li dij in. Brîtanya jî nivê dilê wan di dîroka Iraqê de veşartî ye, nivê din jî bi Amerîkîyan re ne. Amerîkî jî stratejiyên cihanî dimeşînin. Hêza sereke ya li cihanê jî nikare bi temamî çavên xwe li helwestên Rusya, Çîn û Yekîtiya Ewropayê bigire.

Bi taybetî em Kurdên bakur, dema durîşmên xwe diyar dikin, gotinan dikin, divê hay ji rastiya dinyayê jî hebin. Ji ber sedemên li jor pêşkêş kirî, carekî din dibêjim divê tevgera Kurd qedre

Peymana Selehedînê bigre û bibe zêrevanê vî peymanê.

Hêvîdar im, ev mejiyê siyasîyên realist û aliyê netewî ve jî kurdewar û Kurdistanî li başûrê welatê me, li perçeyên din jî bibe stûna siyaseta Kurd û Kurdistanê.

Zerar û ziyana me çî ne?

Yekser şehîdên Sibatê yê Hewlêra paytext tî bîra min. Serjêkirina xortan tî ber çavên min.

Erişkeriyên şovenîst û nijadperest li Kurdistana binxetê, serhildana Qamişloke û bi dehan şehîdên me tî bîra min.

Birayê me li rojhilat hat dardakirin û gundiyan bi destê pasdaran hatin kuştin tî bîra min.

Li bakurê Kurdistanê, di şerê hîlebaz de xuşk û birayên me yê ku li çiyayê Gabarê, heremên Xerzan û Dêrsimê tî kuştin; Umîdê donzdeh salî ku zêdetirî jimara temenê wî gule bera wî dan, wî û bavê wî li pêş derê malê kuştin tî bîra min. Hin kesên ku bi navê kurdîtiyê înkariya Kurdistanê, dewletê, federasyonê dikin, tî bîra min...

Lê ne xem e, dawiya tariyê her tim ronahî ye!

Xwina şehîdên me, keda welatperwer û neteweperweran vala naçe. Em bi hêvî ne. Miletê Kurd û birayên me yê ne Kurd binecîhên Kurdistanê, emê bi hevra bigihînin doza xwe. Azadî, Aştî, Demokrati û Emin û Aramî para me ye, me heq kiriye.

Lê ji bo van armancan divê em sala 2005 an jî her bitîkoşin!

Carekî din jî sersala we pîroz be!



Cemal BATUN

Erdhêj û tsunamî ya li Okyanûsa Hindî pêk hat, gelek rastî ji bo tevayîya raya giştî ya cihanî raxistin ber çavan. Di vî trajedî-rûdana ku bû egera mirina heta niha ji zêdetirî 150 000 mirovan, hevvelatîyên bi dehên welatan hebûn. Ji Awusturalya bigre heta Amerika, ji Turkiyê bigre heta Swêdê. Gava tsunamî xwe li berava welatên derdora Okyanûsa Hindî xist, hîn di rojên destpêkê de hate zanîn ku siruşt û rewşa gelek welatên derûber dê bikevin bin xeteriyek berçav de. Ji xwe tsunamîyê jî deh welatan zêdetir xist û ji Asya û Afrika welat ketin bin pêlên wê yê dijwar.

Xem jî global e... Bextewarî jî global e...

Xema tsunamîyê ne tenê li welatên ku xist ve ma. Dibe ku carekî jî carên yekem be, ku bêje tevayîya mirovayetiye angajeyî vî rûdana siruştî bû. Bi hezarên turist ji Ewropa, Amerika, Awusturalya, Afrika û béguman Asyayê wenda ne. Hêvî jî, ku ew zindî bêne dîtin nema ye. Bi milyaran mirov jî aliyên din ên cihanê xwe gihandin hawar a rûdana tsunamî yê.

Xema vî rûdanê, bû xemek global!

Rast e! Di cihanê de gelek pirs neman e ku tenê welatekî eleqader bikin-bi taybetî jî rewşên weha ku bi qeder, pêşeroj, pêşketin û demokrasiyê ve girêdayî ne. Heta pirsên şirketan jî çerçoweyek neteweyî derketine, bûne navneteweyî, bûn e global.

Turkiye hîn jî dirabe û dibêje-pirsa Kurd pîrsek min ya navxweyî ye. Em qebul nakin ku dewletên derve xwe mijûlî pîrsa Kurd bikin. Ne bi dilê me ye, ku delegasyon û nûneratiyên welatên derve, bi taybetî yê Yekîtiya Ewropa

seredana Diyarbekrê bikin. Di bin vî yekê de meqsedên din hene û hwd.

Hey Rebenno!

Cihana me ketiye pêvajoyek global de. Neçareserîya pîrsa Kurd, pîrsek global, pîrsek navneteweyî, pîrsek demokrasiya cihanê ye. Ger pîrsa Kurd bikeve rêya çareserîya xwe de, divê bête zanîn ev pêngavek bexteweriyê jî bo swêdiyekî, almanekî, heta ji bo amerîkîyêkî ye jî. Ji ber ku pîrsa demokrasiya, pîrsa mafê mirov, pîrsa mafê neteweyekî - pîrsa pêşketina mirovayetiye û yek ji babetên herî global a tevayîya mirovayetiye ye.

Xem jî dikare global be...tsunamiya Okyanûsa Hindî ev yek carakî din diyarkir...Bextewarî jî dikare global be-gava pêvajoya demokrasiyê serdikeve. Gava pîrsek wekî pîrsa Kurd bikeve rêya çareseriyê de...

cbatun@yahoo.se

IMPRESSUM

XWEDIYÊ ROJNAMEYÊ
PEYAMA KURD VERLAG
PEYAMA KURD
THOMAS-MANN-STR. 22, 53111 BONN / GERMANY
FON: +49 (0)228 18 00 654
+49 (0)228 18 00 655
FAKS: +49 (0)228 18 00 656
WWW.PEYAMA-KURD.COM
INFO@PEYAMA-KURD.COM

REDAKSIYON

KURMANCIYA JORIN:
FADIL OZCELİK (EDITÖRÊ BAKUR, FO),
SÎRWAN HEÇI BERKO (EDITÖRÊ ROJAVA Û DIASPORA, SHB),
SİLÊMAN ALIXANÎ (SA), Z. PIRKEMAL (MAGAZÎN Û
BÊHNVEDAN ZP)

KIRDKI (ZAZAKI):

SEYİDXAN KURUJ (EDİTÖR, SK)

KURMANCIYA JÉRIN:

DANA ALI, VENUS FAIQ, SİMKAN AZİZ,
NİZAR CAF, COTYAR DARFIROŞ, MANSUR SIDQI,
MUSTAFA CHUARTAY

PEYAMA KURD JI MAFÊ XWE DIBÎNE, KU NIVÎSÊN JÊ RE TÊNE ŞANDIN, KURT BIKE. EW JI ALIYÊ RÊZIMAN Û RASTNIVÎSÎNÊ VE DI SERASTKIRINA BERHEMAN DE AZAD E. PEYAMA KURD BERHEMA KU JÊ RE TÊ ŞANDIN Û BERÊ LI CIYÊKÎ DIN HATIBE BELAVKIRIN, NAWÊŞÎNE.

Xewnên Îttîhat-Terakiyan û Kemalîstan

Kurd sinoran nasnekin ji mafê wan e, ji ber ku ew sinor welatê wan bê viyana wan parçe kiriye telen sinoran gundên Kurdan, heta malbatên Kurdan ji hevdu parçe kiriye. Hêbet dê dem û dewran bê, gund û malbatên Kurdan ji tîl û mayinan azad bibin

Gelo peyva ku dewlet nikare bike bi Ecevit dide kirin?

Di 4ê meha 1ê de rojnamevanê Milliyetê Fikret Bila ku bi nêzîkiya xwe ya bi artêşa Tirk re tê naskirin, bi Ecevit re hevpeyvînek çêkir û axaftina wî ya rojek berê pê re rastkirin da. Ecevit gotibû ku Ismet İnönü jê re gotiye, "wexta ku şert bikemilîn Mûsilê bistinin. Ey heqê Tirkîyê ye."

Ecevit niha "siyasî wesiya" Ismet İnönü ye ku ew ji mîna wî Kurd e dixwaze bi cih bibe û Dewleta Tirk Mûsilê û Kurdistanê dagir bike. Li gora Ecevit divê Tirkîyê têkeve Başûrê Iraqê (Kurdistanê) û tedbirên xwe bistîne, bereyajiya ve tehlûkeya ku "Kurdistan dakeve Başûrê rojhilatê (Bakurê Kurdistanê) dikare derkeve holê.

Ecevit dibêje ku rojekê Ismet İnönü bangî min kir û got: "Em bi Atatürk re li ser vî fikrê bûn. Mûsil heqê Tirkîyê ye. Wê wextê geweta me û şert ne kemilîbûn. Me nestend. Ger şert bikemilîn Mûsilê bistinin, ev heqê me ye." İro şert kemilînin

Ecevit dibêje, ji ber ku hewce nekiriye, heqa niha ev "siyasî wesiya-



Ecevit direvine

ta" İnönü ji tu kesî re negotiye. Çimkî ji şalên 1970 vir de dibêje Ecevit, wexta ku astengiyek me ya ewlekari çêdibû, me leşkerê xwe dişand Iraqê û Sedam ji ber ku nedixwest bê zanîn ku di nav erdê wan de leşkerên welatekî biyanî heye, bê zanîn dengê xwe dernedixist. Ecevit radigihîne ku pêwendiyên Tirkîyê bi Iraqê re gelekî baş bû, loma hewçedariya mudaxaleyê tune bû. Lê iro şert pêk hatine.

Kurdistanê mezin xewna

wê Bakurê Iraqê dakeve Başûrê rojhilat (Bakurê Kurdistanê) Li gora Ecevit Kurdên Kurdistanê Başûr di bin siwanekî siyasî de yekitiya xwe pêk tînin, tî xwestin ku Kurdên Bakur jî beşdarî vî yekitiyê bibin. Ecevit xeyala Kurdan ya şedsalan weha tîne zimên, "Ger yekitiya di bin siwanekê de pêk bê, tenê îlankirina serxwebûnê dimîne. Ew tî wateya perçekirina Tirkîyê" Li gora Ecevit îşaretên vî yekê tîne xuya kirin û ger dereng bimînin wê Tirkîyê ber bi parvekirinê ve biçê. Ecevit berdewam dike, "Min çendek berê ev endîşe û fikirên xwe ragihand Birêz Serokomar."

Amerîka li dijî dagirkirina Kibrisê jî bû

Li ser pîrsa Bila Ecevit dibêje ku "bi liheyhatinek bi Amerîka re dagirkirina Kurdistanê çêtir e. Lê Amerîka tiştêkî nake an nikare bike.

Yekitiya Ewropa li dijî Tirkîyê her piştigiriya grûbên Kurdan dike."

Ecevit bi bîr tîne ku wexta Tirkîyê Kibris jî dagirkiribû Amerîka û Britanya li dijî derketibûn.

Ji bo Federasyonê ji Amedê 260 îmze

Guçlu anî zimên ku di wê îlanê de se xalên balkêş hebûn û ew her tiştî wiha bi nav kirin: Xala yekemîn û girîng ew bû ku di îlanê de, mafên gelê Kurd bi awayekî zelal hatibûn zimên û weke mînak, tecrûbeya Bask, Katalan, Îskoçî, Valon, Flaman û Tirolîyan hatibû destnîşan kirin.

Xala duwemîn ji girîng bû, ji ber ku gelek kesayetên ji herwest û nerînan cûda înzeya xwe avêtibûn hîşt wê îlanê.


Li gor dîtinê fîzîkî Guçlu, xala sêyemîn jî ew bû ku Kurdan di wê îlanê de doza sistemek federal dikirin û tiştê hîşt ku dewleta

Tirk rabe ser piyan jî ew daxwaz bû. Bi diyarkirina vî daxwazê him rastiya dewletê zelal bû û him jî rastiya hinek kurdan.

Guçlu, dide zanîn ku piştî vî dengvedanê pêwîst hatiye dîtin, li bajarekî mîna Amedê kampanyayek ji bo komkirina înzeyan çêbibe û ew bi vî karî rabûne. Li kolanên Amedê 260 îmze hatine komkirin û daxuyanîyek ji bo çapemeniyê hatiye dayîn.

Tê ragihandin ku di derbarê vî xebatê de polîsan doza îfadedayîne li wan kirîye û wan jî biryar daye ku bi awayekî girseyî biçin îfadayên xwe bidin.

Li Hewlêrê êrîşa leşkerên Amerîkî hat protesto kirin



Hewlêr - Di derbarê êrîşa li Hewlêrê de peyamnêrê Peyama Kurd ragihand ku berî teqînê, dezgehên Amerîkî yê îstîxbaratê li Kurdistanê çavderiya hinek cihan kirine, û gumanên wan çêbûne ku grûbek terorîst li wan derdorên di nava hewlêdanê çalakiyan de ye. Weke ku tî zanîn 12ê meha derbasbûyî, li Hewlêrê çend terorîstan li ser kolaneke sedmetroyî tirimbêlek teqandibûn û hatibûn girtin. Şeva 4ê vî mehê hejmarek helikopterên Amerîkî bi ser ezmanê bajarê Hewlêrê de geriyên, û katjimêr 12 û çarîyekê bi katê Kurdistan, çend rokêt avêtin beşê navxweyî yê zankoyê ku bi navê şehîd Xeyrullah Abdulkertîm tî naskirin.

Hinek çavkaniyên nêzîk ragihandine ku çend kes jî beşa navxweyî ya zankoyê (cihê raketina xwendevanan) hatine girtin. Her wiha tî gortin ku jî derûdora beşa navxweyî ya zankoyê teqandin li hêzên Emerîkî hatiye kirin.

Wezîrê karûbarê navxweyî yê hikûmeta herêma Kurdistanê Kerim Sencarî di derbarê vî rûdanê de daxuyanîyek da û diyar kir ku, operasyon bê sedem hatiye kirin û wî ew bûyer şermezar kir.

Li nav bajarê Hewlêrê bi sedema vî bûyerê nerazîbûnek li hemberî hêzên Emerîka çêbûye û Kurdistanê di wê baweriyê de ne ku bûyerên bi vî awahî, ewlekari û aramiya welat xerab dikin.

Dewletên Erebi û Tirk dijberên xwe wek terorîst îxracî cihê din dikin

Kadim Kan

Li salên 70- 80 i de, di bin bandora şerê sar de, di navbera Amerika û Sovyetê de, hinek dewletên Erebi li bakurê Afrika û Rojhilata navîn di navbera xwede bûbûn du beş.

Beşek jî dabûn ser şopa sosyalîstiyê û beşek jî dabûn ser şopa kapîtalîstiyê.

Ne gerekî îspatkirinê ku Ereben Baasî ne sosyalîst û Ereben ne sosyalîst jî ne liberal demokratbûn.

Di eslê xwe de ew dewletên Ereban wek Misir, Cezayir, Sûriye, Irak, Ereben Suudî bi autokratiyê dihatin û tîndîrîtin. Dewlet bi zilm û zora mixeberatan (Biranînek piçûk. Mixeberatên Sûriyê çaxa ku xelk bi seetan di dora nan de li devê deryê fîrna disekinîn, dihatin û diçûn diketin pêşiya serê dorê, destê xwe dikirin hemêza xwe kagizek qirêjokî derdixist û digotin ena mixeberat, nanê xweş li pêşiya xelkê distent û diçû mala xwe. Ez dibêjim qey mixeberatên Hitler bixwe de jî hinek şanazî hebûn lê di mixeberatê Sûriyê de ew jî tinebûn, zilma rojane carna wek neynika sistemê bi xwe ye) bi rêve diçûn/diçe.

Herdû sistemên serekî (Amerika û Sovyet) alikariyê siyasî û aborî didan diktatorên wan dewletan û sistema mixeberatiyê li ser piyan dihiştin.

Pozîtîv yan negatîv, bi dilê me be yan na, di civaka Erebi de jî hinek dînamîkên gewrandinê hene! Yek ji wan dînamîkên aktîv di nav Ereban de beşên dîndar in.

Yek ji sebebên geşbûna tevgerên îslamiya radîkal ew bû ku di pey 20-30 salî de negewirandina siyasî û aborî bûn. Ango ne Baasî bûn xwediyê aboriyek sosyalîst û ne Ereben Misirê û Suudî bûn xwedî aboriyek liberal. Di vî noktê de îslama polîtîk bû wek rîya sêyemîn, yan jî mirov kare bêje wek alternatîv li himber herdu sistemên di civaka Erebi de reh berda.

Ji ber xwe, di serê peşî de tevgerên îslamî li himber diktatorê xwe bixwe bûn. Lê bi rîya şerê Afganistan û Filistinîyan û bi pê re Ereben Suudî û a heri giring nationalizma Erebi ku bi hêsani di nav xelkê de ji xwe re cî didit, bi vî awayî tevgera îslamîstan xist bin kon-

trola dewleta xwe.

Îro roj tevgera îslamî nîne ku ne di bin fermana Îran, Sûriyê û Ereben Suudî de be. Ne ecêbe ku dewletên Ereba tevgera fundamentalista îslamî wek mirîşkêtn serjêkirî li himber gewrandinên li min-tiqê bi kartînin. Ango, misilmanên radîkal dev ji dijminê xwe berdane û dest bi şerê dijmine xwe kirine.

Bi vî re diktatorê xwe kirin alternatîv ji bo Amerika û Ewrûpiya.

Diktator û sistema mixeberatiya Ereba bi vî awayî muxalefeta heri xeter a li himberê xwe kanalîze ciyekî din kirin. Sûriye û filistinîya muxalefeta îslamî li hember Israîl û niha jî li himber Amerika û Kurda bi kartînin. Ereben Suudî, Urdun û dewleta Tirk terorîstên xwe îxracî Kafkasya û Iraqê dikin. Li gor medya, di nav terorîstên Beslan de, ku bi sedan zarok kuştin, Tirk û Erebi hebûn.

Dewleta Swêd çend Ereben filistinî girtine û dibêjin "di destê me de argumen heye ku destê wan di terorkirina Hewlêrê de heye" ku ji sedî zêde Kurd şehîd bûbûn.

Îro li başûrê Ewrûpa û bi taybetî li Bosna, bi hezaran Erebi ku hatin û şerê îslamiyê li himber Sirba kirin, di pey şerê de hikûmeta Bosna destûr da wan ku bibin hemwelatiyê Bosna. Ew Ereben ku potansiyal terorîstbûn, îro li Bosna xwedi mal û jin in. Gelek ji wan li înstîtutên îslamî, ku perê wan ji Suudî û ji Ereben xaliç tî, bûne "mîsyoner" û xwe kirine sergerê kultura Erebi û îslamî. Birayê Bosniyan "Tirkên laik" jî bo ku ew nikarin "mîsyoner" bikin, her hal hinek aciz in. Wek xuyaye Erebi bi rîya pera û nationalizma Erebi dînamîk e, ku li himber wan bixwe, li gor reng û qabiliyeta tevgera îslamî wan dişîne cihê din.

Tecruba dewleta Tirka jî di vî warî de ne hindik e. Çawa îtiraçiyê pkk ji bo xwe kir tetikçî û mîrxasên Kurda bi destê keleşên Kurda dan kuştinê, îro jî îtiraçiyên netewî firoş jî bo xwe dike Kemalîst da ku rojekê şerê Kurda bi cemawerî bikin.

Daxwaza girtina polîsan red bû

Li doza Ugur ê 12 salî û bavê wî Ahmet Kaymaz, ku ji aliyê polîsan ve hatin kuştin, bûyerek din a nehuqûqî, zêde bû. Daxwaza girtina polîsan canî hat redkirin



Di îddianameya serdozgerê komarê yê Mêrdînê de, tê xwestin ku polîsên sûçbar, negirtî bîn darizandin. Parêzerên malbata Kaymaz jî ku li himberî vî yekê îtiraz kirin û xwestin, li dadgeha cezaya giran a Mêrdînê, polîs di rewşa girtî de bîn darizandin.

Parêzer Huseyin Cangir û Erdal Kuzu daxwaz kirin ku li gorî xala 104mîn a qanûna îsulê ya dadgeha cezê, divê polîs bîn girtin. Lê belê, dadgeha cezayê giran bi sedema ku polîsên sûçbar karmendin, red kir. Erdal Kuzu ku li himberî biryarê nerazîbûn nişanda, diyarkir ku ewê li himberî biryara redkirinê, serî li dadgeha raser bidin.

Êdî jinên Kurdistanê jî di siyasetê de bihêz in!



Peyamnêr/Memed Eren

Nûnera jinên Kurdistanê şaxê Hewlêrê Mîdiya Hesên diyarkir ku êdî jinên Kurdistanê jî di siyasetê de xwedî gotin û bihêz in. Hesên diyar dike, ku komela wan di 1952an de hatiye damezirandin û armanca wan ewe ku piştigiriya mafên jinên Kurdistanê bikin û wan şiyar bikin. Hesên dibêje, ku di 1950 û 60an de zilm û zorek mezin li ser gelê me hebû û azad nebû, ji ber vî me zêdetir nikaribû mafên jinên Kurdistanê biparazta. Lê piştî serhildana herêma Kurdistanê pêk hat, sertên azadiyê û parlamentoyê çêbûn û êdî me bi aşiyane (eşkere) kar

Nûnera jinên Kurdistanê şaxê Hewlêrê Mîdiya Hesên diyarkir ku êdî jinên Kurdistanê jî di siyasetê de xwedî gotin û bihêz in

û xebatên yekîtiya jinên Kurdistanê derxiste pêş. Êdî em dikarin derkevin gasîn û meydana û nehêlin ku mafê jinên Kurdistanê bîn xwarin.

Herweha Mîdiya Hesên destnişan dike, ku di nav adet û kevnetoriyên Kurdewarî de hin bûyerên nexweş çêdibin û ew dixwazin bi tundî li dij wan kevnetoriyan rawestin û mafên jinên Kurdistanê biparêzin. Wek "qelen, berdêlî, keçikên piçûk didin kalemêran, bedelxwîn û wedî din". Ji aliyê din Yekîtiya Jinên Kurdistanê jî xwe re wek erk û wezîfe dizane ku ji bo jinan şiyar bikin, ewê qurs, semîner û çalakiyên din pêkbinin da ku jinên Kurdistanê di vî warî de hişyar û zana bikin.

Mîdiya hesên diyar dike ku wan li gel Hihûmeta Herêma Kurdistanê peymanek danîne ku dezgeh û komeleyên din ên jinan bîn damezirandin û ev yek heta radeyekê bi serketiyê.


Zext û zora li ser jinan berdewam e

Navenda Pêkanîna Mafê Jinan a Baroya Amedê rapora xwe ya 2004 belav kir

Di sala 2004 an de 348 jinan serî li Navenda Pêkanîna Mafê Jinan a Baroya Amedê dane û ji sedî 78 kesên gazinc ji zex û zora di nava malbatê de kirin e. Heta Tebaxa sala 2004an jî 153 jinan serî li Qanûna Parastina Malbatê dane û di derbarê 78an de biryara stendina tedbiran hatiye girtin.

Nûnera Navendê Meral Daniş Beştaş, dibêje ku zêdebûna gazincên di warê şideta nav malbatê de, bilindbûna asta zanebûna jinê nişan dide.

Beştaş dide zanîn ku şideta li hemberî jinê di nav civakê de rewşa tê ditin û divê di warê pirsgerê jinan de, ji bo çareseriyê pêkanînen ciddî bîn kirin. Xanim Beştaş dibêje ku di vî warî de berpirsyarî dikeve ser milê hemû beşên civakê û divê herkes di serî de ji xwe dest pê bike.



Kursek ji bo nivîskar û rojnamevanên Duhokê



Di roja 3/1/2005an de bi mebesta berçavkirina giringiya helbijartinan û paldana xelkê ji bo ku beşdariyê tede bikin û diyarkirina rol û erkê rojnamevanan di vî pirosesê de, sendîka rojnamevanên Kurdistanê bi hevkarî digel rêkxirawa mafên medenî li Duhokê, xoleke rojnamevaniya taybet ji bo hejmarek nivîskar û peyamnêrên dezgehên ragehandinê saz kir.

Hêjayî gotinê ku "25" kadirên ragehandinê divê xolê de beşdarin û biryare çend rojan berdewam bit.

Li Îranê zextên li ser Kurdan ranaweste

Îran - Rejîma Îranê ku di nava tengasiyên mezin de digevize dev ji siyaseta bi zextan Kurdan kontrol bike bernade. Rêvebirên rejîma Îslamî li bajarê Salsalê serokên eşîrên Kurd li hevdu dicivînin û li ser wan cerdevanî ferz dike. Her weha rejîma kevneperest esnafên Kurd yê ku cerdevaniyê qebûl nakin bi girtina dikanên wan tehdît dikin.



Ji bo sendîqevanên Kurd ji Îranê re name hat şandin



Rojhilatê Kurdistan - Konfederasyona sendîqeyên karkerên azad a Cîhanê, ji bo balê bikşîne ser rewşa 7 sendîqevanên Kurd ên li Îranê tîn darizandin, ji serokomar Muhammed Xatemi re, name şandin.

Konfederasyona ku ji 152 welatan xwedî 148 milyon endamiye, da xuyakirin ku ew ji rewşa sendîqevanên li bajarên

Saqiz û Sîne yê Rojhilatê Kurdistanê hatibûn girtin û hêna tîn darizandin, bi gumanin. Di nameyê de tê gotin ku sendîqevan Burhan Dîvengerd û 6 sendîkavanên Kurd ên din bi alîkarîdayîna saziyên Kurd, tîn tawambar kirin. Konfederasyonê ji rayedarên Îranî xwest, tevî dadgeha sendîqevanan bibin.

Kurdan ahenga serê salê li Almanya gêra



PK/Duisburg - Di şeva 29/30-12-2004an de lijneya rêkxirawa (PDK) ya bajarê Duisburg a Almanya, ahengek ji bo revenda Kurd li herêma (Nord Rhein West falen??) saz kir.

Bi rastî aheng bi şeweyekî giştî bi başî bi rêveçû û stranbêjên beşdarbûyî şîyan xosiyê di hola ahengê de belavkirin. Helbet kak Segvan Tirwanîşî ku karê birêvebirina ahengê dikir, di serêxistinê ve ahengê de rolek xweyî mezin hebû.

Di ve ahengê de diyar bû ku ew hevalên

bi karê amadekirina ve ahengê rabibûn agehiya wan ji hevdû nebû, loma dema em (rojnameya Peyama Kurd) çûn, li ber derê holê gelek pirsyar ji me hatin kirin û digotin peyama Kurd kiye û kê hûn daxwazkirine? her çendî ku em ji bo ve ahengê hatibûn daxwazkirin û di du hejmarên (Peyama Kurd) de me bi bê beramber reklam ji bo ve ahengê dikir.

Hêvîdarin li ahenga newrozê ku wek wan gotî dê ya mezintir bît, ev kêmaniyên ku hebûn nemînin.

Pirsa yekîtiya netewî û siyasî, pirsa kê ye ?

Keya Îzol

Gava mirov rojname, kovar yan jî sîteyên internetê ya kurdan dixwîne yek ji mijara sereke yê wan, pirs, "pewîstiya yekîtiya netewî-siyasî ya kurdan" e. Min qet nexwedniye û nebistiye ku kesek rabe bibêje ku na xêr, yekîtiya kurdan pirsêkî ne girîng e û îro ev ne di rojêva kurdan de ye. Tendensa hakim herweha di navgel de ji wisa ye. Xelkên ku xwe kurd dibînin, dilên wan bi êşa kurdariyê dişewite, qurbanî dane, rojane bûyerên çar perçeyê Kurdistanê taqîp dikin, di dilên xwe de daxwaza "yekîtiya netewî" xwedî dikin. Hêviyek wisa bingeha xwe ji dirêjeyîya dîroka kurdan wergirtiye. Hemû kesên welatperwer li ser pewîstiyê wisa hemfikir in. Maneya wê, ev pirs îro di rojêva kurdan de ye. Baş e ji ber çî yekîtiyekî wisa hetta îro di nav kurdan de pêk nehatiye? Gelo sebeb çî ye, çî asteng li pêşîya wê digre? Di rewşa îro de berpirsiyarî ya kê ye? Divê pêşî kî pêşengîya ve yekê bike? Kesên ku xwedî van daxwaz û raman in divê ji xwe ve pirsê bikin.

Gelo pirsên wisa li cem gelên din çawa hatine çareser kirin? Dibe ku dîroka wan di vî warî de bikaribe alîkarîya me bike. Mixabin ferqa me û neteweyên din li vir vekirî dîyar dibe. Dîrok şanî me daye ku neteweyên cûrbecûr yê Ewrûpî pirsên xwe yê wisa di wextê xwe de çareser kirine. Destpêka qirna 1900 an. Yekîtiya netewî wek pirsê acil li rojêva wan de îro nîne ji ber ji xwe ev pêk hatiye. Gava neteweyek ji wan di bin talûke yan xeterê de bin, hemû kategoriyên civatê wê bêşik bi yekdeng û yek helwest li hember xeterîyan herket bikin û neteweyê xwe biparêzin. Wê tu hêz yan kes ranebin û bi awayeke eşkere piştevanîya hêzên êrîşker bikin. Tu kes wê bi "hêzên dijmin" herket nekin. Ewrûpa di vî warî de xwedî tecrubeyê mezin e. Hin hemwelatîyên Norwec, Fransa û Belçîkayê di dema şerê cîhanê ya dîwem de li hember berjewendîyên welatên xwe bi hêzên Nazîyan ve hevkarîyê kiribûn. Di dagîrkirina welatên wan de rola wan jî hebû. Kes yan hêzên wisa ji aliyê wan welatan ve hatine tesbît kirin. Di dîrokê de rolên wan bi eşkere wek îxanetê hatiye binav kirin.

Welatê me Kurdistan sedan sal in ji aliyê dewletên êrîşker hatiye dagîr kirin. Hebûna me, hetta zimanê me,

navên me qedexeyê. Neteweyek ji 30 milyonê bêtir mirov bê dewlet, bê otorîte, bê qanûn mecbûrê jiyaneke bindestiyê bûne. Bi milyonan kurd bi destê wan hêzan hatine helandin, welatê me hatiye talan kirin, bi milyonan kurd hatine surgûn kirin. Ya balkêş ew e ku ewende tede û zordestî tenê bi destê hêzên

dijmin pêk nehatiye. Hejmareke mezin yê kurd jî wek (hevkar, çav û korîçî) li hember miletê xwe êrîşker bûne. Di vî talanê de para wan jî mezin e. Qasê ku kurd wek neteweyê ji van kesan zerar dîtîye ji dijmin zerar nedîtîye. Dewletên dagîrker li gor tecrubeyên xwe ji zêf-bûna hestên netewatiyê di nav kurdan de îstifade kirine û li gor planên taybetî pêşî wan anîne li hember hev. Paşê di nav wan de ji xwe re alîgêr peyda kirine. Ev pêvajoyê hetta îro jî wisa berdeham kiriye. Li başûrê Kurdistanê bi azadkirina perçeyê welatê me ev nusîbet ji ortê rabûye. Yekîtiya netewî îro li ser hemû berjewendîyan e, ev hest her diçe bihêztir dibe. Îro li Başûr ne mumkun e ku hin kes rabin û eşkere piştevanîya rejîmê kevn ya Iraqê bikin. Ne rewşê dide ne jî xelqê ve qebûl dikin. Tendensên wisa li Başûr mir û careke din zû bi zû naye holê.

Kurdên Bakur jî ber ku hê jî dîroka me ya nêzik li ber me de ye divê ji ve dîroki ders derxînin. Herweha Kurdistanê Başûr bi tecrubeyên xwe yê 13 salên dawîyê ji bo pêşerojê me bibe nimûne. Nêzîkbûn yan jî hevkarîya siyasî li Bakur divê li ser esasa berjewendîya netewî û hestên kurdewariyê pêk were. Gava ev bingeh wek raman rêbertîya hevkarîyê siyasî ya pêşerojê bike, dikare li gor berjewendîya netewî bimeşe. Hingî dijmin nikare wek sedan salan pêk anîye, îstifade ji rewşa me bike. Heke nêzîkbûna me ya siyasî li ser bingehên prensîbî nebe, bê pîvan be, wê çawan li ser lingan bimîne? Dîroka me çavkanîya me ye. Bersîvên çareserîya rewşa îro di rûpelên dîroka kurdan de hatine binav kirin. Xeletî û şaşiyên ku bûne asteng li pêşîya yekîtiyekî netewî li Bakur, di dîroka me de dîyar in. Divê xeletî dubare nebin. Hêzên siyasî yê kurdan wek garantore pêşerojê kurdan divê erkên xwe binin cih. Hingavên ji bo yekîtiya netewî-siyasî li Bakur divê di bin berpirsiyarîya wan de were meşandin. Herweha keseyatên welatperwer divê wek erk bi hemû hêzên xwe ve piştevanîya ve hingavê bikin.

Li Bûtanê cigarekişandin hat qedexeyê kirin

Kraliyeta Bûtanê bû welatê yekemîn ku li seranserê welêt kişandina cigare hat qedexeyê kirin. Berdevkê Balyozxaneyê Bûtanê li Delhî (Hindistan) di 17ê mehê de ragihand ku êdî li Bûtanê kişandin û firotina tûtînê hat qedexeyê kirin û got ku sedema qedexekirinê pa-

rastina tenduristiya gel, çewre û kulturê ye. Tiryakiyên ku nikaribin dev ji kûrmên xwe berdin, êdî wê ji sedî 100 bacê bidin û cigareyên ku ji dervî welêt tîn bikirin û tenê li mala xwe bikşînin.

Nifûsa Kraliyeta Bûtanê 734 hezar e û di navbera Çîn û Hindistanê de ye.

Berfa Sipî, Bextê Reş

Felat Dilgeş



Îsal tam sala 90an e, erê 90 sal di ser malwêranî û felaketa Sariqamîşê re derbas bû. Sariqamîs, ku yek felaketên herî mezin ê miletê Kurd e, belkî jî sedemê bingehîn ê bîndestî û perîşaniya me ya îroyîn e jî. Rast e, dîrok li ser ferzkirinê nayê avakirin, belê kî çi dibêje bila bêje, eger hêza leskerî ya gelê Kurd li Sarqamîşê nehata hederkirin û miletê Kurd şikestek weha mezin nexwara, îro em ne di vê rewsê de bûn. Belkî îro em ji zû ve xwedan deweleteke serbixwe bûn, di encama ser de Kurdan dewleta xwe ava nekira jî, Serhildana Şêx Seîd wusa bi rihetî têk nedichû.

Çawa û çima? Niha em li bersîva vê yekê bigerin. Gelo not hezar leşkerên ku di eniya şer de, pîrrianiya wan bêyî ku gulekê biteqînî li Sariqamîşê, li Çiyayên Allah û Ekber, di çillên zivistanê de mirin û berfa sipî ji wan re bû kefen kî bûn? Pîrrianiya wan, ji pîrrianiyê zêdetir, belkî ji sedan %80-90ê wan Kurd bûn; Kurdên Suwarên Hemîdiyê bûn. Hingê navê Hemîd hatibû hilanin û ji sala 1908an vir ve ji wan re, Alaya Suwarên Sivik dihat gotin. Alaya Siwarên Sivik ji esîrên Kurdan pêk dihatin. Alayên suwarên sivik, wek hêzeke leşkerî ya di bin ferdandariya dewleta Osmanî, di ser de, li gel leşkerên Osmanî cihê xwe distandin. Ji xwe ji roja rojîn ve Evdilhîmîd, bi armanca ku ewê wan li hember Rûsan bide şerkin û di parastina sînorên Rojhilat de ji wan istifade bike, ev hêz avakirbû.

Taybetiyek din ên ordiya Osmanî jî ew bû ku ordî ji hêza herêmî, ango ji leşkerên ji herêmê dihat avakirin. Di eniya Sariqamîşê de, wê ordiya 9. û 10. li hember Rûsan ser bikirana. Belê leşkerên van herdû ordiyan jî, xên ji qedema îdarî, hema bêje tevahî Kurd bûn.

Dewleta Osmanî, bi fermana Enwer Paşa, tam di nav çillên zivistanê de Eniya Ūris vekiribû. Xên ji Enwer û generalên Alman, herkes bi taybetî di van çillên zivistanê de li hember ketina şer bû. Belê Almanya, li Polonyayê, li hember ordiya Rûs û Sîrp di tengahiyeke mezin de bû, loma dixwest ku bi destê Osmanîyan rojekê zûtir eniya Qafqasyayê veke û bi vî awayî hêza ordiya Rûs belav bike, barê xwe jî piçekê sivik bike.

Rejîma Îttihad û Terakkî, bi hêviya ku ewê axa ku berê hatibû hundakirin cardin bi dest bixe û xwe bigihîne Tirkên Asya Navîn, welatê Turan ava bike, bi Almanyayê re hevkarî çêkiribû, belê bi tu awayî ne amadebû ku rabe û di çillên zivistanê de li hember ordiya Ūris bikeve şer. 120 hezar leşkerên ku bi fermana Enwer tafilê xwe li Eniya Ūris ditibûn, hê bi kincên xwe yê havînê digeriyan; ne livasek li ser wan, ne jî midasek baş

di lingê wan de hebû. Li gel vê erzaqa wan jî tunebû. Enwer bi xwe jî rewsa wan ditibû. Loma di fermana xwe ya êrişê de weha digot, "Leşkero, min we hemûyan dît! Min dît ku di lingê we de çaroxa we, li ser piştê we paltoyê we tune. Belê dijmin ji we ditirse. Di nêzik de emê êriş bikin û bikevin Qafqasyayê. Hûnê li wê derê her cûre nan û nîmetî bi dest bixin."

Di 26ê Çilleyê Pêşî yê sala 1914an de leşkerên Osmanî, ya rast Kurd; ti û birçî, tazî û perîsan hilkişiyên çiyayên Allah û Ekber. Ji nişkave ba û berfê lêkir, gêdûka berfê rabû. Serma û seqem di binya -40 derceyî de bû. Çav çavan nedidit, dengê kesî nedichû yê din. Herkes ketibû hewleriha canê xwe. Tofana berfê rabûbû, ji serma û ji seqemê, ji gêdûka berfê bi deh hezaran can li Çiyayên Allah û Ekber telef bûbûn. Hem jî bêyî guleyekê biteqînî.

Laşên wan di bin berfê de mabû. Zivistanê gewr li wan hatibû xezabê. Berfa sipî ji wan re bûbû kefen. Kes nikaribû here ser miriyê wan jî. Wusa bi mehan di bin berfê de man. Dawiyê, ordiya Ūris a ku ewê li hember wan şer bikirina, cenazên wan ji bin berfê derxistin û veşartin.


Di nav çend rojan de, pîrrianiya wan Kurd û Suwarên Hemîdî, 90 hezar mirov miribûn, ya rast hatibûn telefkirin. Hingê nufûsa tevahiya dewleta Osmanî 12 milyon bû. Gava ku ev trajedî û telefkirina mezin ji Enwer Paşa hat pirsîn, wî got, „Ew Kurd bûn, me tişt hunda nekiriye!“ Rast e, wan tişt hunda nekiribû, malik li Kurdan xera bûbû, pist li Kurdan şikestibû, kertikê koletiyê wê rojê ketibû stuyê miletê Kurd.

Ji wê rojê vir ve miletê Kurd piştê xwe rast nekir. Eger ew hêz, wê zivistanê li Çiyayê Allah û Ekber nehata telefkirin, wê qedera miletê Kurd cihê bûya. Kesi nikaribû wusa bi rihetî bi miletê Kurd bileyizta û li masa dîplomasiyê ew nehêsibanda. Di serê Agirî de, gava ku Osman Sebrî dixwest bigre ser Rihayê û bajêr bistîne, hingê tenê bi qasî 100 leşkerên Tirk li bajêr hebûn. Eger 60-70 hezar ordiya Suwarên Hemîdî li Kurdistanê hebûya, piştî ser, wê Mustafa Kemal wusa bi rihetî Kurdistan teslîm bigirta? Bawer bin, hema di serhildana pêşî de wê Kurdan tevahiya axa xwe, sed qat ji Ereban rihettir bikira bin destê xwe û hingê kesî nedikirin Kurdistanê.

Jibîr nekin, di serhildana Şêx Seîd de jî, hêza leşkerî ya esasî, pirtikên mayî yê Suwarên Hemîdî ne.

Li Sariqamîşê, bextê miletê Kurd, di bin berfa sipî de reş bû. Ji wê rojê vir ve bihar netat welatê me. Ji bo me hê jî çillên zivistanê ye.

Saddam Husên parêzerê xwe dît



Saddam Husên, ji roja ku hat girtin û heta niha, cara yekeme ku parêzerê xwe Khalil Duleimi dibîne. Di vê hevdîtîne de Saddam tiştên balkêş anîn zimên.

binerim. Ez ji xwarinê ne gazindarim. Eskerên Amerîkî bi min re napeyivin, lê eskerên vir ên Iraqî ji min re dibêjin "Serokê birêz". Derfetên rojname. Guhdarkirina Radyo û televîzyonê nîne. Nameyên malbata min jî sansur dikin. Nahêlin ez xwe kur bikim. Bi vê dixwazî ji dinyayê re bêjin "Saddam Husên di depresyonê" de ye. Eskerkişandina Îspanyayê biryarek rast bû. Ew bawer dikin ku berxwedana heyî bê haya min çêdibe, lê fermana berxwedanê min dabû. Ev êrişên niha dibin bi zanîna min dibin. Ji bo rawestandina şer ji min xwestibûn ku ez Îsraîlê nasbikim, lê min ev qebûl nekir. Pişrî Iraqê wê armanc bibe Sûriyê. Ez ji bo wan natirsim. Berî şer min ev ji Beşar Esad re gotibû.

Iraq - Li gor malpera internetê a bi navê Debka, ku wek nêzikî îstixbarata Îsraîlê tê naskirin, hevdîtînan çar seetan berdewam kiriye û Saddam ev tişt ji parêzerê xwe re gotiye:


Ez di kozîkek 3-5 metroyî de dimînim. Carna dihêlin ez ji hêwanê li ezmên

Li Suriyê Mafê Mirovan, Kirasekî ji Agir e

Hikûmeta Beşar el Esed li Suriyê di warê başkirina mafên mirovan de tu gavên berbiçav neavêtine

Suriye - Tê ragihandin ku hikûmeta Beşar el Esed di warê başkirina mafên mirovan de tu gavên berbiçav neavêtine û sala 2004 an bûye sala ku herî zêde mafên mirovan têde hatine bînpêkirin. Parêzvanê mafên mirovan El Bunni diyar dike ku di sala 2004 an de bi sedan Kurd hatine girtin û dibêje, aliyê wan bûyeran yê baş ewe ku pîrsa mafên mirovan li Sûriyê xistin rojeva raya giştî û êdî çavên Ewropa li ser Sûriyê ne.

El Bunni bi berdewamî dibêje: Ev 40 sal in ku Sûriyê bi zagonên awarte tê birêvebirin. Beşar el Esed, di warê azadiyên siyasî de gavek bi tenê jî neavêtîye. Rejîm bixwe li ser bingeha înkarkirina mafên mirovan hatiye avakirin,



ji ber vê yekê ne hêsana e ku ew mafên mirovan bipejirîne. Ew dizanin ku pejiwandin û parastina mafên mirovan dawîya rejîma wan bixwe ye, ji ber vê yekê gavên berbiçav navêjin.

Li Almanya qanûnek nû

Li Almanya, ji bo entegrekirina koçber û biyanan qanûnek nû ket jîyanê

Almanya - Li Almanya, ji bo entegrekirina koçber û biyanan qanûnek nû ket jîyanê. Bi qanûna nû re, wê di sistema bazara hêza kar û ewlekariya civakî de guhertinên mezin çêbibin.

Li gorî qanûna ku bi awayekî fermî ket jîyanê, kesên ku nû diçin Almanya, koçber û biyanîyên li Almanya dijîn, an wê tevli kursên ziman bibin û an jî wê rastî ceza û astengiyên bînan. Hêza karkerên ji derveyî welatên Yekîtiya Ewropayê tînan, bi qanûna nû tê sererastkirin.

Li gorî vê yekê, ger hêza kar a li welatên Yekîtiya Ewropayê têra hewcedariyan neke, hingê wê ji hêza karkerên ji derveyî YE sût bê wergirtin. Li gorî vê qanûnê, eyaletên Almanya xwediyê wê erkê ku penaberên weke `xeter an jî

tawanbar` bînan destnîşankirin dersînor bikin.


Li Almanya sistema karê zarûrî destpêkir

Li Almanya, bi sala nû re projeya reformek radîkal a di warê aborî de destpêdike. Li gorî vê yekê, wê perê ji bo betalên ku demeke dirêj bêkar mane, kêman bibe, wekî din wê sistema xebata bi seetê Ewroyek bê ferzkirin.

Tê gotin ku kêmkirina heqdestê betalên, wê rê li karesatê veke. Li gorî dezgehên alîkariyê yê Almanya, betalên ji bo demeke dirêj bêkar mane, wê nikaribin debara xwe bikin û ev yek wê tesirê li qasî nîv milyon zarok û malbatan bike û şertên xizaniyê girantir bike.

Nehêniya bajarbûna Duhokê!

Silêmanê Alîxanî



Bajarê Duhokê beriya 36 salan bû parêzgeh. Wê demê tenê hin xwendegên seretayî û diwanavincî lê hebûn, tu peymangeh, zanîngeh û kargeh nebûn, astê xwendinê gelekî nizim bû, cade û rêyên navxwe û derve kêmbûn û qirkirî nebûn. Tu komele û civatên hunerî, wêjeyî (edebî) û civakî lê nebûn. Bi kurtî Duhok gund bû û ev rewş nîzî bîst salan berdewam bû. Her çende ku hin xwendegên, "yek-du" peymangeh û hin cad lê hatin vekirin û ji bo fermangeh "mûdiriyet" yê hikumî jî hin avahî hatin avakirin. Lê ne bi qasî pêwîstiya xelkê wê bû ku pir bûbûn û pêwîstiyên wan jî digel wan mezin bibûn. Ta piştî serhildana 1991an, her çende ku barê abûrî yê hikumet û xelkê bajar gelekî xirab bû, ji ber dûrpêça abûrî ya li ser Îraqê û Kurdistanê û dûrpêça dewletên dagirgerên Kurdistanê li ser herêma Kurdistanê. Lê Duhokê geşkir û ava bû. Zanîngeh, peymangeh, kargeh, hotêl, yarîgehên werzişî, cihên geşt û seyranê, çapxane û cade lê hatin vekirin. Çendîn komeleyên siyasî, rewşenbîrî, hunerî, civakî, çendîn kanalên televizyonî yê navxweyî, çendîn rojname, kovar, belavok û senterên entirnet û gehandinê hatin damezrandin. Bi dehan gundên derdûrê hatin avedankirin. Sermayedarên Kurd û yê biyanî parên xwe anîn Duhokê û bikaranîn. Bi taybetî piştî sala 1996an.

Niha jî berdewam piroje dihêne bicihanîn û ew bajarê ku beriya bîst salan mîna gundekî bû û hejmar "nifûs" a xelkê wê çend deh hizar kes bûn, niha mezin bûye û nêzîkî niv milyon mirov lê dijîn. Rojane bi hizaran tirimbêl ji hemû bajarên Kurdistanê û Îraqê diçin Duhokê. Hem ji bo seyran û hem ji bo bazirganî û gelek jî ji bo ku lê bicih bibin. Gelek jî dixwazin lê bimînin lê ji ber ku her tişt "xanî, kirê, her tiştê girêday jiyana mirov ya rojane" li Duhok giran bûye, nikarin vê xwesteka xwe bicihbînin.

Helbet mezinbûn û ciwanbûna bajêr bala xelkê biyanî dikişîne û her kesê serdana bajêr dikin, pesnê wê didin û bawer nakin ku wiha lê hatiye. Bi taybetî yê ku beriya niha dîtibûn, berî çend heftiyên di pirogrameke (k.tv) de

diktorekî Ereb, ku diktora bi zanistên hunerê de heye got: şeweyê avabûn û ciwanîkirinê wesa kiriye ku Duhok mîna bajarên Ewropî lê bê. Helbet bajarên Kurdistanê yê din jî mîna (Silêmanî, Hewlêr) ava dibin, mezin dibin. Lê eger em hevber bikin digel jî "temen"ê wan, bi rastî Duhok di demeke gelek gelek kêmbûn de mezin

bû. Çimkî Silêmanî her ji roja damezrandinê, beriya du sed salan bajar bû, dîsan Hewlêr jî, lê Duhok wek me got gund bû.

Li vir ez dixwazim bêjim ku geşkirina Duhokê, tenê yek sedem hebû ew jî ew bû ku "Duhok aram bû û aram e" û her ji piştî serhildanê û hêrve, ew bajarê bi tenê bû li Kurdistanê û Îraqê ku şerên navxweyî û nexweşî tê de çênebûn. Gelek kes vê çendê jî bo zîrekîya detshildariyê li Duhokê vedigerînin, lê ez ne digel wan im. Çimkî gelek bajarên din jî li jêr heman deshildarî de ne, wek Zaxo ku nêzîktirîn bajare jî bo Duhokê, lê wek Duhok geş nekiriye û avedan nebûye. Ez dibêjim ku aramperweriya xelkê Duhokê û baweriya wan bi wê rêbaza ku wan helbijartî û viyana wan ji bo tenahiye, rê li ber pêşketinê vekir. Nebes tu şer li Duhok nebûn, belkî pirs-girêkên civakî û tawanên "dizî, kuştin û ...htd" jî pirs-girêkên ku dinav her civakekê de hene. Li Duhok di kêmin û eger em rêjeya tawanê li Duhok hevber bikin digel Zaxo, em dibînin ku li Duhok kêmtire, her çende ku Duhok du car bi qasî Zaxoye. Dîsan ew tawanên li Duhok dibin jî bêtirîya bikerên wan xelkên Duhokê nînin. Ew jî nîşana aramiya Duhokîyan e.

Helbet aramiya Duhokîyan jî nehênî "sirr" a xwe heye ew jî ewe ku xelkê wê wek hev hizir dikin û yek bîr û bawera wan heye û ji ber ku bîrûbawera wan yeke, xilaf dinav wan de çênebûye da ku şer û nexweşî çêbibin. Her çende Duhokî gelek kom û grupin; Kurd, Kildanî û Aşûrîne. Netewe perwer, komonîst û demokrat in. Musilman, Kiristîyan û Êzîdên e. Û van gropan jî gelek baregehên wan hene, lê rê û rêbaza wan yeke, li ser wê rê digihin hev, ew rê û rêbaz jî ewe ya ku hunermendê mezin şivan Perwer di strana xwe (Duhok a rengîn) de dibêje, ya kalê "BARZANÎ" ye.

Li Sudanê ji bo aştiyê agirbes

Sûdan - Teverga rizgariya gelê Sûdanê ku ji bo otonomiya civakên xiristîyan û animîstên Başûrê Sûdanê tediqoşe, bi hikûmetê re peymanek agirbesa demî mohr kir.

Ji bo misogerkirina aştiyê, hikûmeta Sûdanê û teverga rizgariya gelê Sûdanê, peymanana agirbesê îmze kirin. Bi vî awayî serok dewletê Sûdanê Alî Osman Muhe-



med Taha û serokê teverga rizgariya gelê Sûdanê Con Garang, li dû hevdiştinên ku 2 salan dewam kirin, li hev hatin û dawî li şerê 21 salan anîn.

Bi peymanên hatine morkirin, li Sudanê divê hikûmetek koalîsyonê bê avakirin û ligel erk û desthilatiyê çavkaniyên petrolê bîn parvekirin û artêşê bê entegrekirin.

Pirsa Kurdî li Suriyê: Çareseriyêke çawa?

Divê Pirsa Kurdî di çarçewa yekîtiya Suriyê de bê çareserkirin

Wêke ku tê zanîn, beşek ji gelê me yê kurd li herêmên Cezîrê, Kobanî û Çiyayê Kurmenc (Efrîn) bûye para dewleta Suriyê, ya ku di destpêka sedsala bûrî de, li gorî peymanên navneteweyî, nû hatibû damezrandin. Û ji wê hingê ve, pêşeroja gelê me yê kurd li Suriyê bi tevayî bi pêvajoya gelê Suriyê ve hatiye girêdan.

Lê tucari tîkiliyên kurdayetiye di navbera vî beşê gelê me yê kurd û biraderên wî li perçeyên dîtir ên Kurdistanê nehatine birin. Ev yek jî di gelek bûyer û bo-neyan de diyar û naskirî ye.

Ji çaxa ku Suriyê wek dewleteke nû pêk hatiye, gelê kurd û ereb û kêmeteweyên vî welatî bi hev re jiyana xwe bi rengê aşitiyane didomînin, û berî 50 salî bi hev re şerên rizgarkirina welatê xwe (Suriyê) jî destên dagirkerên fransî kirine. Ango ez dixwazim bibêjim ku milletê me bi du nasnameyan tê girêdan: ji hêlekê kurd e, ji hêlekê ve surî ye, bê ku ev herdu nasname li dij hev bin. Lê rêjîmên serdest tucari li mafê milletê me mûkir nehatine. Ne tenê wilo, lê wan tim dixwest wî di nav piraniya erebî ya li welêt de bihelînin. Lewre zimanê gelê me tim û tim qedexe ye, pirojên şovenist li dij wî tene ajotin, û rastiya hebûna wî ya dîrokî li ser xaka bav û kalên wî tê bincilkirin. Herweha rola milletê me di avakirina welêt de tê windakirin.

Ji sala 1957an ve, dema yekemîn partiya kurdî li Suriyê hate damezrandin, ev rastiya han li ber cavê wê bû, anga gelê kurd li Suriyê beşek ji civaka Suriyê ye, û divê mafên wî yê neteweyî, demokratîk û mirovan di çarçewa yekîtiya Suriyê de bêne bidestxistin. Û ji bo vê yekê jî, em hemî şeweyên kar ên aşitiyane û demokratîk ji xwe re rewşa dibînin.

Herweha li gor xwendina me ji rewşa hundirê Suriyê û rêjîmên serdest ên cuda re, rastiyeke dîtir jî hatiye çesipandin, ew jî ewe: Peywendiyek diyalektîk di navbera pirsê gelê kurd li Suriyê û rewşa siyasî ya hundirê welêt bi tevayî hatiye peydakirin. Lewra, em ji zû ve li gor van

baweriyan siyaseta xwe dihûnin, û ji ber wisa jî, em tim bang dikin:

- Divê Zagona Awarte (ya ku ji sala 1963an ve li dar e) ji jiyana gelê Suriyê rabe.
- Divê dadgehên awarte nemînin û girtiyên siyasî û hemî girtiyên nerînê - çî kurd, çî ereb - bêne berdan.
- Divê siyaseta tekpartî nemîne.
- Divê hêzen ewlekariyê destên xwe ji hemî movikên jiyana hemwelatiyê Suriyê bikişînin, çî di warê siyasî, aborî, çape-meniye de û hwd.....)

Divê nifûsa Suriyê (nasname) li dora 250 hezar mirovên kurd ên herêma Cezîrê vegere (ew kesên ku li gorî Serjimartina Awarte di 1962an de nifûs ji wan hatibû standin).

Divê hebûna gelê kurd wek neteweya duyemîn li Suriyê di destûra Sûriyê de bête nîşankirin û zimanê kurdî bi serbestî bête xwendin û hinkirin.

- Divê projeya Kembera Erebî ya nijadperest ji holê rabe û xaka Kurdan li wan vegere.

Divê civaka Suriyê ji vê rewşa aborî ya xerab derkeve (ji ber ku bêtirî 65% ji civakê di bin xêza xizaniyê de dijî).


Bi kurtî, armanca me ew e: Suriyêke demokratîk ku hemî mafên mirovan tê de parastî

bin û gelê kurd bi mafên xwe yê neteweyî şa bibe.

Bi rastî, ev jî xebateke mezin jê re gerek e, ji ber ku mixabin, hêzên guhertinê li Suriyê pir qels in, û rêjîm jî li serê xwe siwar e, guh nade dengê civak û xwestekên wê. Ji ber wilo jî, em dibînin ku yekîtiya tevgera me yê kurd li Suriyê pêdiviyê neteweyî, demokratîk û dîrokî ye.

Partiya me hewil dide ku çarçeweke kurdî saz bike, hemî hêzên tevgera kurdî tê de beşdar bin, da ku hemî bi yek dengî daxwaza mafên gelê xwe yê perîşan û bindest bikin.

* Serokê Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Suriyê - Yekîti-



Ismaîl Umer* Qamişlo

Hikûmeta Sûriyê malperên internetê digire

Sûriye - Hikûmeta Sûriyê, ji bo girtina malperên internetê, bi milyonek dolarî alav û cihazên taybet kiriye.

Li gorî nûçeya malpera Erebî ya bi navê Îlaf, hikûmeta Sûriyê, ji bo girtina hin malperên Kurdî û Erebî cihazên taybet kiriye. Di wê nûçeyê de tê gotin, li gorî vê yekê hin malperên

Kurdî û Erebî hatin girtin û mailên ku ji van malperan re tînin şandin, ji aliyê dewleta Sûriyê ve tê kontrol û kopîkirin. Li hemberî vê helwestê, rewşenbîrên li vî welatî nerazîbûn nîşan dan û anîn zimên, ku ev tê wateya binpêkirina azadî û mafê mirovan.



Hediye Dag

Sala 2004an da xuyakirin bê vîrûsên compûterê karin çî bikin û çî nekin. Vîrûsan hem nivîskarên xwe navdar kirin hem jî serê şirketên antivîrûsê eşandin. Vîrûsa Mydoom ê jî serê sala 2004an bigrin heta bi serê sala 2005an jî bandora xwe berdewam kir û di rêza sereke de çî girt. Şirketa Microsoftê 250 hezar dolar xelata girtina nivîskarê vîrûsa Mydoomê daniye. FBI jî di vî derbarê de lêkolînên hûr û kûr dimeşîne.

Hin belayên din ên 2004an jî vîrûsên ku ji Mydoomê hatine afirandin "Bagle û Netsky" bûn. Ev herdu "mîkrop" wek ku pîrsgirêkên afirandine ne besbûn îcar di nava xwe de jî bihevketin. Kîjan jî wan berê tîketa compûteran ewê din rêşdikir û bi nameyan berê xwe dida compûterên din. Li gorî lêkolînan di hersê mehên 2004an de zirara vîrûsan a diravî (aborî-maddî) 128 milyar dolar bû.

Di nava salê de nivîskarê vîrûsên Netsky û 28 vîrûsên din Sven Jashcanê 18

salî yê Alman hat girtin û li sûcê xwe mikur hat. Tiştê balkêş ew bû, ku gava Jashcan dihat darizandin, ji alî şirketa Alman a bi navê Secure Point ve wek karker hat xelatkirin û ji bo pêşdebirina sistema parastinê ew girtin kar. Yê ku di compûterê de reklaman didin, malperên internetê bi malperên porno-seksê diguherin û kodaş (password) didizin û li xwedî vedigerîn (spyware) mohra xwe li sala derbasbûyî xistin. Li gorî lêkolînan niha di her compûterê de li dora 28 adetên ji van nivîsên spyware hene.

Di rewşa vîrûsan de tişt nayê guhertin. Li gorî lêkolîna Internet Storm Centerê, li dinyayê 100 milyon compûterên windowsbarkirî, bê ewlekariyekê bi internetê ve girêdayî ne. Dîsa li gorî vîrûsê lêkolîne, di nava 20 deqîqan de vîrûs dikevin nava van compûterên ku bê ewleyî girêdayî internetê ne. Ji aliyê din dîsa tê eşkerekirin ku ji her 12 nameyan yek jê bi vîrûs e. Li gorî lêkolînan di 2004an de hejmara vîrûsan 100 hezar derbaskiriyê.

Sala 2004an sala vîrûsan bû

Li gorî lêkolîna Internet Storm Centerê, li dinyayê 100 milyon compûterên windowsbarkirî, bê ewlekariyekê bi internetê ve girêdayî ne

Vîrûsa telefonan

Hinek ji balkêşên 2004an jî 64 bit û vîrûsên telefonên desta (mobil, handy) bûn. Vîrûsên telefonên desta bi navê Rugrat û Cabir ketin nav rûpelên dîroka teknolojîyê. Ev vîrûs bi riya teknolojîya bluetoothê ê xwe dihûnan û belav dibûn. Ji aliyê din xweveşartina vîrûsan jî balkêşiyek din bû. Herweha bi riya wêneyên (sûret-resim) JPG ê jî vîrûs belav bûn. Pîsporên antivîrûsan diyardikin ku vîrûsên nuhî gellekî tevlihev in.

Kurd, internet, vîrûs û antivîrûs

Bêguman, toknolojîya internetê gellek derfetên baş jî û yê xirab jî ji me Kurdan re anîn. A baş eve, ku Kurd hînî teknolojîya internetê bûn, xwe pê dîghînin seranserî cihanê û derd û mereza xwe radixin ber çavan. Di serdema teknolojîya îro de, internet bûye çekê jî çekên tekoşîna weşangeriya Kurdî û bi vî weşanê pij û keleman di çavên dijminên gelê Kurd de radike. Ev baş û pîroz e. Lê ji aliyê din a xirab jî eve, ku em li beramberî du vîrûsên sereke ne, du vîrûsên ku dermanê wan antivîrûs e.

Vîrûsa yekem: Êdî internet ji me re bûye nexweşîya brîna reş û ketiye mejî û bedena me. Em nema karin xwe jê xilasbikin û li derûdora xwe binerin. Vîrûsên internetê xwe li bedena me pêça û hûnaye. Rewş û pergala Kurd û Kurdistanê ji ber çavên me rabûye, alozî û sergêjiya li Bakurê Kurdistanê nayê bîra kesî. Bê bîra me jî, şewq û ekrana internetê ava reş bi çavên me de aniye û ji ber şewq û ekrana internetê em kor bûne. Ji ber go em nikarin ji ber ekrana internetê rabin, em nikarin bîra cem hev û çareseriyekê ji vî nexweşîya xweya xedar re jî bibînin. Belavbûn, ezezi û hop-hopa kesayeti vîrûsa herî xedar û nexweşîya bêderman e.

Ev jî bêguman, bi kêrî pisporên vîrûsan tê. Ango; bi kêrî Kemalîzmê tê!

Vîrûsa duyem: Vîrûsa duyem, û ji bo me ya herî xedar vîrûsa Kemalîzmê ye, angoo; vîrûsa Kemalîzmê ye. Dewleta Tirkî, bi her awayî vîrûsa xweya Kemalîzmê bera mejî û xwîna Kurdan dide û bi vî vîrûsa duserî mîna axtapotan xwe li bedena Kurdan dipêçe. Seriyek ji vî vîrûsê dewleta Tirkî bi xwe ye. Seriyê din jî xwarzê û destbrakên wan, Kurdên Kemalîst in. Bi van herdu rîyan dixwazin rist û sistema mejî û anatomiya Kurdan ji hevde bixin û "GEN"ên wan ên Kurdewarî klon û kopî bikin û Kurdan bikin Tirkî. Ji aliyê din bi vî vîrûsa Kemalî giraniyê didin pişavtin û alozkirina zimanê Kurdî û li Bakurê Kurdistanê di vî warî de serketinên mezin bi destxistine. Berdevka Komara Demokratîk Leylo Nezan bi wê Tirkîya xweya "Îstanbulî" serkêşîya pişavtina zimanê dayika xwe dike û lotkên çargavî dide xwe. Ev vîrûs, vîrûsa herî dijwar û xirabmal e.

Antivîrûs: Rêlibergirtina vîrûsan bi antivîrûsan mimkin e. Antivîrûsa me Kurdan jî heye bêguman, û navê wê "Yekîti" ye! Yekîti, hevkarî, tifaq û silava germ antivîrûsa meya herî mezin e. Heger em bixwazin rê li ber vîrûsên dijminên gelê Kurd bigrin, divê em serê xwe ji nav rûpel û malperên internetê derxînin û bi mejî û ruhekî Kurdewarî bêm ba hev û hevdû himbêz bikin. Bi vî antivîrûsê emê karibin çareserîya pîrsgirêkên xwe bikin û bibin pij û kelemên çavên dijminên Kurd û Kurdistanê. Yan na bi serê we, wê vîrûsên Kemalî hertim ekrana internetê li ber me reş bikin!..



Nameyên we Nameyên we Nameyên we Nameyên we Nameyên we Nameyên we

Birêzan,

Min bi dilxweşiyek bilind bihist ku rojnâmeyek Kurdî derketiye. Bi vî kêfxweşiyê, ji bo ez rojnâmê bigirim bi tevayî 25 km rê çûm û min ew kirî. Min hêvî dikir ku ev rojnâme xizmetek niştimanperwerî bi çî bine, valleyek çapemeniya Kurdî dagire, û herwiha yelpazeyek dorfireh ya xwendevanan himbêz bike.

Lê mixabin, bi xwendina hijmara 15an ya rojnâmeya we Peyama Kurd, ev hêviya min tîk çû û weke gelek carên berê ev yek dîsa di xeyalê de ma...

Ji ber ku min di vî hijmarê de dît, ku armanca we bitenê dijberiya PKK-Kongira-Gel, birêz A. Öcalan, û DEHAP e. Islûba hûn bi kar tînin, ji çarçoveya rexnegirtina dostanî û niştimanperweriyê gelekî derbas bûye û xwe gihandiyê asteke dijminatî.

Gelek tabîî ye, ku mirov di çarçovake niştimanperwerî de sazî, partî û weşanên Kurdî rexne bike. Ez li gel vî yekê me heta dawî, eger ev yek di çarçoveya niştimanperwerî, bi hindikayî di nav ya dostanî de bimîne. Lê mixabin, islûba hûn bikar tînin, ji rexneyê zaftir,

sixêf (çêr), reşkirin, heqaret û hwd. ye. Ji ber vî rewşê jî tîjdan û xîreta min destûr neda min, êdî ez xwendina rojnâmeya we berdewam bikim.

Loma jî ez wek mamosteyekî Kurd bi dostanî dixwazim, bala we bikşînim ser hin mînakên vî hijmara rojnâmeya we ku dijberiyên navxweyî yê 10 sal berî vîga li bîra mirov tîne.

1. Rûpel 2: Daxwiyaniya Kurdan, rûyê gelekan eşkere kir..... - Bayram Ayaz

„...Lê ji aliyekî din ve, jahra apoyîtiyê ketiye laşê wan û mejiyê wan çeliqandiye...“

„...Eger mirov bixwaze miletekî bindest li gor hesabên dewleta dagîrker û mêtînger bixapîne, wî kerr û gêj bike, divê mirov bi temamî wekî A. Öcalan bike. Elheq, vî karî „zilam“ baş dike. Vêca ku hûn xuşk û birayên me vî rastiyê hêj navxwazin bibînin, mirov şaş dimîne!..“

2. Rûpel 4: Ev ne tu hal e!- Fadil Özçelik

„...A. Öcalan di dîroka Kurd û dinyê de ne kesê yekemîn e ku bi vî ecêbê her tiştî serûbin dike. Lê divê bê gotin ku tu kesî jî qandî wî ne zirar daye gelê xwe û ne bi bîr û

bawerî û bi hêvî û heyalên gelê xwe listiye û şikandiye...“

3. Rûpel 8: Demokrasiya Tirkî û aqilê me-Laleş Qaso

„...Qedandibûn dibêjim ji ber ku kurd bi axa xwe, ziman û siyaseta xwe kurd bûn û kemalîzmê jî pêşî bi rêya PKKê bi milyonan him kurd ji ser wê axê avêtibûn û him jî asîmle kiribûn; û dî re jî bi rêya HADEPê siyaseteke bazirganî û tolaziyê pêşkêşî xelkê kurd kiribû...“

„...Intelletuelê tirkî ê herî zana Simail Beşikçi bû û ew di demekê de bûbû berdevkê PKKa generallan...“

„...Em divê hişê xwe bînin serê xwe û dev ji çîrt virtikên demokrasiya tirkî berdin, di bin tesîra PKKa xayîn û HADEPa devrût û tevşût de nelivin û qeweta xwe ji bo demokrasiya tirkî serf nekin...“

„...Kurdên ku dikarin xwe di ber zirçoneyekî wek A. Öcalan de bişewitînin...“

Mirov dikare hîn jî mînakên zêde bike. Lê ev çend mînak tenê bes in.

Kesayetiya min destûr nade, ku ez di nav


polemikên wiha de çî bigirim û tiştên wiha niqaş bikim û bersiva wan bidim. Eger ez bersivê bidim, divê ez jî xwe bînim asta van nivîskarên navê wan derbas dibe, ku ji duristiya nivîskarî û rojnâmevaniyê bêpar mane û danenasîn pêşketina xwe li ser tîkçûn û reşkirina kes û saziyên kurdistanî xeyal dikin.

Ez cardin wek mamosteyekî Kurd ji we hêvî dikim, ku hun rewşa ûslîb û xeta Rojnâmeya xwe ya weşanê di ber çav de derbas bikin û derfê nedine nivîsên dijberiyên navxweyî zêde dikin û zirarê didine Gelê Kurd. Bila ev kurdiya me ya şêrî ji bo yekîtiya Gelê Kurd xizmet bike, ne ku dijminatî û dijberiya navxweyî gurr bike.

Eger di vî xeta weşanê ya niha de were israrkirin, ezê bibêjim xwezî bi Tirkîya Hurriyetê, ne bi kurdiya Peyama Kurd.

Mamoste Emîn Akbaş

Têbînî: Ev nivîs be guherandin hatiye weşandin



Umit Firat

Lê bi başî û kêmasiya xwe ve em karin bêjin du daxuyanî biserketiye

Çi gaya ku li Tirkîyê daxwaza nûjeniyek ku riya civakê veke û daxwaza demokratîkbûnê bike bê kirin, tê gotin, ku "niha ne wextê wê ye, civak jê re ne amadeye" û sedemên 100 salî pêşkêş dikin. Bêguman, em Kurd jî bi vê çandê mezin bûne.

We ji bo kî ev daxuyanî derxist?
 Hîna di destpêkê de, me daxuyanî bi nameyekê re ji xwediyên imzan re ragihand. Me di binê namê de ragihand ku ji bo imzageran du krîter hatine destnîşan kirin. Ez nameyê wek xwe radigihînim.

Birêz.....
 Bêguman, di dema ku têkiliyên Tirkîyê-Yekîtiya Ewropa dikeve qonaxê ne de, di sêma yekemîn a muzakeran de pirsgirêka Kurd çî digre. Wek Kurdên Tirkîyê, me dîtînen xwe çikere nekiriye û jêrî û mercên xwe jêrî di derheqê destpêkirina berendametiya Tirkîyê-Yekîtiya Ewropa de amadekirin. Ber çavan û derxistinê holê. Emê nîkarîbîn hevî û daxwazên xweyên, ku ber çavan li beredî çareserîyê ne, li dû hev rêzîkî û bikin daxuyanîyek, evê pir dirêj û zehmet be. Ji ber vê, daxuyanîya Enstîtuya Parisê, ji bo daxwazên asgarî yên Kurdên Tirkîyê, bêyî ku em ferqê têxin navbera dîtînen, ramanebî siyasî û payedariya kesayetiyan cûrbecûr, wek daxwazên hevbeş pêşkêşî imzakerîna dikin.

Ey daxuyanîya hevbeş a ku bê imzakerîna, wê berî 17.12.2004an pêşkêşî rayedar û saziyên Tirkîyê û Yekîtiya Ewropa bê kirin. Herweha ewê di rojnameyek Tirkîyê de û di çend rojnameyên navdarên Ewropî de bi zimanê Îngilîzî û Fransî bê weşandin.

Em bi hevîya beşdarî û eleqa we ne Silav û rêz. 25 Ciriya Paşîn 2004

vi wextî de em qet rane-westiyan, me xwe gihand kesên ku destê me digîha wan Lê mixabin, me nîkarîbû em xwe bighînin hemû kesên ku me dixwest. Ji ber vê jî me di nêda imzeyên wan. Dibe ku listeyek baştir karîbû bi-hata amadekirin, hevalên me karîbana xwe bigihandana gellek hevalên din û ew li derveyî vê daxuyanîyê nemana. Bê guman divê wextê me hebe ku me imzeyên gellek hevalên din jî bi destbîrista. Divê em vê qebûl bikin. Em nîkarîbîn heq nedînin kesên ku li derve mane û gazîndan dikin.

Gelo em biserketin? Bêguman bersiva vê li me nakeve. Lê bi başî û kêmasiya xwe ve em karin bêjin du daxuyanî biserketiye.
 Heger em dema xwe bidin daxwaz û paragrafa tall.

Tê gotin ku,
 "Em ji rayedarên Tirkîyê û Yekîtiya Ewropa dixwazin, ku mafên Kurdan ên meşrû bidin ber çav; aştîya herêmî, îstîqrar û dadmendî pêk bê û ev di riya Yekîtiya Ewropa de bînin nîrxandin." Ji ber vê jî em karin bêjin herda. Wek tê zanîn, xala yekemîn a têkiliyên Tirkîyê bi navnetewî re xala pirsgirêka Kurd e. Ey xala ku herdem di rojevê de ye, lê bêyî ku ji xwediyên meselê bê pîrsîn, hema nebe dîvîyabû daxwaz û dîtînen Kurdan bihatana zimên. Heger ne wilo bûya, wê dewletê wek Lozanê çend figuran (Dengir Firat, Leyla Zana, Mehmet Metiner ûwd) bikarbanîna û rola Kurdan di zemînek cuda de bidana lîztînin. Di warê wextê de hinek raberizandin çêbûn. Kultura siyasîya ku em tê de dijînin ev adet pêkaniye. Çi gava ku li Tirkîyê daxwaza nûjeniyek ku riya civakê veke û daxwaza demokratîkbûnê bike bê kirin, tê gotin, ku "niha ne wextê wê ye, civak jê re ne amadeye" û sedemên 100 salî pêşkêş dikin. Bêguman, em Kurd jî bi vê çandê mezin bûne.

daxwazan wê xebata me berdewam be. Ji bo em karîbîn van daxwazan bi çîh binîn, divê êdî em karîbîn hevda fêmîbikin û li hev gihandî bikin. Zehmete ku em niha bêjin di nava me de kultura demokrasi û pîrdengîyê çêbûye. Gava ji ber dîtînen xweyên cuda me jî bi stûrî û xalîtiyê bê darizabîdî û tehdîtkirin, mana xwe ev e, ku ji bo yekîtiyek wisa hîna em nekemillîne. Ji aliyê din, bêderfet e, ku em karîbîn hinekan ku xwe berdevk û berpirsiyarên Kurdan dibînin, têxin nava vê yekîtiyê. Ev ne mîmkîna e. Wekî din ez daxwazî vê jî bêjin. Ji bo jêrîhatîna ji sazî yan rêxistinên ku xwe berdevk û nînerê netewê gale Kurd dibînin, ji lîro bêhîr wê di rojên pêş de zehmetiyan derxîne holê. Divê em vê jî ber çavan nabînin.

Kesên ku imza xwe liqandî dibêjin haya me jî naveroka daxuyanîyê temabê!
 Qet ne rast e. Gava daxuyanî imzakerîna, maneya gotînen daxuyanîyê, nîpîna kêmîtîgîhiştîna wan bîrwe ye.

Wer xuyaye ji dêvîla ku çareserî bikin û bêjin "me daxuyanî şaş fêmîkiriye", îcar dibêjin "em tev li naveroka daxuyanîyê nabînin". Ji ber ku tu daxwazek wan di derbarê parêzkîşandîna imzeyên wan de çenebû, navê wan ji daxuyanîyê nehat derxistin.

Me daxuyanîyek ji bo imzakerîna vekir. Berî pêşkêşkirîna vê daxuyanîyê em di nava xwe de raberizîna, me sererast kir û pêşkêşî imzakerîna kir. Ango me daxuyanî pêşkêşî nîqaskirîna imzageran nekîr, me xwest ew terçîheke bikin; yan wê imzakerîbana yan wê redkerîbana. Ji xwe hinekan red jî kir. Niha li gor ku we ev daxuyanî imzakerî edî nîqaskirîna we bê mane dibe û hûn dibînin alîgîrek ji yê vê daxuyanîyê. Lê hinek heval jî dêvîla alîgîriya daxuyanîyê bûne mîna dijberên daxuyanîyê. Heger kêmasiyek di vir de

hebe, divê ne ji xwediyê daxuyanîyê lê ji imzagerên ku dibêjin "me şaş fêmîkiriye" bê pîrsîn. Ez di sa dixwazim dîstekî destnîşan bikin. Ev daxuyanî ne biryarê e; Hinek ji endamên heveta biryarmendan ne xwediyê wê hêzêna, ku karîbîn mîxalefetê bikin. Ev daxuyanî, daxwaznameyek e. Ji bo pêşkêşkirîna sazî û rojnameyan hatîye amade kirin. Gorîbêja li ser vê daxuyanîyê ji imzager û aliyê din karîbîn bikin. Divê nerazîbûna serokê CHP ciddî neyê girtin, ji xwe ew hertîm nerazî ye.

Hûn li ser Kurdên Tirkîyê û dewleta wan derxistinê!
 Ev gotîna Untîr jî ji bo me wêk e. Çûne pişavîne li xwe ragihandî. Ez bîrwe gotîna "Kurdên Tirkîyê" wek gotînek nerast dibînin. A yekemîn, Kurdîstanê Tirkî û Kurdîstanê Tirkî ne eynî tişt in. Divê em Kurdîstanê Fransayê, Ankarayê, Aydînê yan Işmîbûlê jî bîrweyêkî bîrweyêkî. A dîyana jî dîyana ku em dîyana dengê me bîrweyêkî be dîyar bikin, ne ku li hêla hîna Kurdîstanê ne, lê di me amadekirîna desthilatdariyê de ne. Û divê em fêhmîyê wisa bigîrin ber çav. Bêguman, Kurdîstanê Bakur an Başûr kêrê jî bo me tiştekî îfade bike; lê ez ne bawerîm ku ji derveyî me, ev gotîna jî hinekan re balkêş be. Ji ber vê, ji bo awîra geleperîya çîhanê Tirkîya Bakurê Tirkîyê çî mane îfade bike, divê Kurdên Bakurê Kurdîstanê jî bi eynî maneyê bê îfadekirin. Li gora min a rast "Kurdîstanê Tirkîyê" ye. Wek berê dihat gotin, Gîneya Fransayê û Gîneya Portekîzê; şetana vîna jî ne ji Gîneyîyan re lê ji efendiyên Gîneyîyan re ye. Ji ber vê, ji ber hinek gazîndan zîzbûna hevalan li ber çav hat girtin û li şûna "Kurdên Tirkîyê" wek "li Tirkîyê Kurd" hat guherîna.

Paye û rêza kesên imzager
 Serokên belediyan, wekîl, wezîrên kevn, serokên belediyan kevn, wekîlên kevn û kesên xwedî meşrûtiyeta demokratîk in.

Nivîskar, hunermend, oldar û berpirsên civakên sivil yên xwedî meşrûtiyeten manewî.

Ji bo imzekomkirîna jî me di nava xwe de kar parvekir. Li gora vê, ji Kurdên ku li Ewropa dijî wê Enstîtuya Parisê imzan kom bike. Li Tirkîyê jî, ji xeynî hinek îstîsnayan (serokên belediyan, serokên hinek partîyan û çend parlamenterên kevn) minê imza kom kiriba. Me dixwest ku di nava 15 rojan de em xwe bighînin imzageran û vê daxuyanîyê derengtirîn lê Çileyê Pêşîn 2004 biqedînin. Di nava

Ji bo çî 17ê Çileyê Pêşîn?
 Di 17ê Çileyê Pêşîn de weşandîna vê daxuyanîyê di çiyê xwe de bû. Heger ev ne di 17ê mehê de, lê berî wê û piştê bihata weşandin, dibe ku me ev rewşa nîqasê niha bi destnîxista. Helbet emê di dema bê de destvala ranewestîna. Êdî dewleta Tirk wê nîkarîbe di destpêkê û berdewamiya muzakeran de xwe wek "Dewleta Tirk" bîlîstîne. Daxwazên meyan bîngîhîna azadî û demokratîkbûnê her wê bîna zimên û ji bo bîdestnîstîna van



Mafê gelê Kurd heye li hember dewleta bakûrê qibrisê raweste

Ömer Özmen

Van rojên dawî, dewleta Tirk carek din li dijî statûya başurê Kurdistanê, ketiye nav listik û lêgerînê qirêj. Di vi warî de, bi dewletên terorîst ra peywendiyên diplomasiyê dimeşîne. Damezrandina dewletek serbixwe li başurê Kurdistanê, ji bo ewlekariya xwe û dewletên heremê wek tehlûke dinirxîne.

Dewleta Tirk ji alîkî ve di salvegera talankirina Kostantinopolisê û dagirkirina Qibrisê de cejnên netewî piroz dike. Li aliyê din, maf û azadîyan ji bo gelên din jî, ji bo ewlekariya xwe tehlûke dibîne. Wek tê zanîn, Tirkîye ji bo 100 hezar Tirkên Qibrisê dewletek konfederal pêşniyarî raya giştîya cihanê dike û ji bo vê yekê dikare di muzakereyên bi Yekîtiya Ewropayê re ji bixe pirsgrêkek bingehîn.

Li başurê Kurdistanê gelê Kurd li ser



axa xwe, li gorî pratîkên huqûqa navdewî û zagonên bingehîn statûya Federasyonê bidestatî. Sê û dergehên dewleta federal, ji aliyê serfirazî ve ji hatîye pejmandin. Kurdan serkardayîyê rewa di pratîka xwe ya 12 salî de bi cihkirina responsalên demokrasiya herdemî dane îpatkirin. Ji bo vê yekê jî, di raya giştî ya cihanê de bi sempatiyek mezin û pêwazîkirin. Bê gumar wek modela demokrasiyê, dewleta Başurê Kurdistanê ji bo rejimên heremê yê terorîst tehlûkêye. Lê ji bo aşîti û aramiya gelên heremê serkevtînekê û îstîqbatê pêwîst e. Hêzên Kurd tu carî erîş hatîne ser axa kesi, bi tu gelên cihanê re dijîmîratî nemeşandine.

Ew dewleta ku rayedarên Tirk dixwazin li bakurê Qibrisê bi cihanê bidin damezrandin ne li ser bingehên huqûqa



navnetewî hatîye damezrandin. Bi destê zorê, bi dagirkirina leşkerî hatîye damezrandinê. Xeynî dewleta Tirk, ji aliyê tu dewleteke cihanê ve nehatîye nasîkirin. Girava Qibrisê gi dîrokê de tu carî ji Tirkîya nebuye cih û war. Di sala 1532an de girav, ji aliyê Fermandarên Osmanîyan Barbaros Keyredîn Paşa ve, çara yekem hatîye dagirkirin û talankirin. Piştî şerê Osmanîyan û Rusan, di sala 1878an li gorî Peymana Berlinê, bexşê Qraliyeta Britanyê dibe. Di sala 1951 an de Wezîrê Karê Derve yê Tirkîye Fuat Köprülü di vi warî de dibêje: "Li ser axa Qibrisê tu mafê Tirkîyê nîne."

Piştî endambûna dewleta Tirk bo Nato yê, di nav konseptê „kimbera keşk“ de li Tirkîyê provokasyonên Gladîyô ê dest pê dikin. Di 6-7ê meha îlonê sala 1959 an de Tirkên faşîst û kevnepereşt li bajarê İstebolê û Enqerê erîş dibin ser gelên Rum û Cihûyan. Mal u milkê wan talandîkin. Bi destê zorê wan dişînin sîrgûnê. Dema ev bûyerên hoviyane tesîra xwe li Qibrisê nişan dide, carek din Dewleta Tirk, „jeo stratejî“ ya „xwe pêşkêşî endamên Natoyê dike. Ji bo aramî û berjewendîya Natoyê alîkarî ji Amerikan û Britanyê bidestdixîne, tevî Britanya û Yewnanîstanê, li ser dewleta Qibrisê ya serbixwe dibe „Garantor“. Şayanê gotinê ye ku ev garantorî tenê di warê ewlekariyê de ye.

Di sala 1974 an de, di dema desthilatdariya Ecevit de carek di girava Qibrisê, dibe wargehê çalakîyên Gladîyoyê. Li wê derê aramî û aşîti xera dibe. Li ser van bûyerên hatî, dewleta Tirk, ji bîrdengmanîya bîrdengmanîyê de dike û li 16ê hezîran 2000ê li Îstebolê Rûm, dewleta Qibrisê ya serbixwe dagir dike. Di encamê ve dagirkirinê de, bi deh hezaran kesên bêgumâr bi metodên hoviyane jiyana xwe ji axa xwe dişînin. Girav dibe du parçî, ji sîsiyan yek axa wî, ji bo 60 hezar kesên

Tirk wek baregehek terorîzmê damezrandîkin.

Demayê rayedarên Tirk, ji bo damezrandina dewletek serbixwe li başurê Kurdistanê bi dewletên terorîst ra dikeyn nav peywendiyên diplomasiyê, bêguman mafê gelê Kurd jî heye ku li hember dewletbûna bakurê Qibrisê raweste. Di vi warî de gelê Kurd û diaspora Kurd, nerazîbûna xwe nişan bidin û çalakîyên girseyî lidarbixînin. Bi gelê Rûm û Yewnanîyan re peywendiyên berfireh saz bikin. Herweha herema bakurê Qibrisê wek baregeha terorîzmê, aramî û ewlekariya Kurdên bakur tehdît dike.

Kujerên li dijî rewşên bîrên Kurd hatîne bikaranîn yê wê Haluk Kırcı, Abdullah Çatlı, Alattın Çakıcı, Oral Çelik û hwd. bi salane di vê heremê de çalakîyên xwe organîze dikin, ji aliyê din ve di bin navên bazîrganîyê de karê mafyatik dimeşînin.

Li gorî belgeyên ku nivîskarê Tirk Ferhat Ünlü destnîşan dike: Di herema bakurê Kibrisê de, bi şîrikatiya malbata Hafîz Esad, ji terefê Mîlî ve gelek banqên bi diravên reş (perên ku serkaniyên wî ne dîyar) spekulatîf li ser navê Of-Shore hatîne damezrandin. Sê heb ji van banqeyan bi navê First Merchant, Ünlübank, Alliance Invest tîn bikaranîn. Di nav dameziranvanên wan de Mehmet Eymür, Tarık Ümüt, Ömür Özçelik (Parazgêrê Mehmet Agar), Kozyar Mahmood, Cenk Ermîyah, Hakki Yaman Namli, M. Abjal Raja hene (Serkanî pirtûka Ferhat Ünlü bi navê Eymür'ün Aynası. Metis yay.sa:37-38-39, bi zîmanê Tirkî)

Ji salên 90 î vir de, ji bo ku ne di bin kontrola sazîyên aborîya navnetewî de bûn, diravê reş li ser navê banqê Off Shorê, bi hêsayî transferê Tirkîyeyê dibûn. Piştî di banqê Tirkîyeyê yê tay-



betî de dibêje pêşîkîrin. Ev banqê taybetî, piraniya wan bi destê malbata Demirel, Uzan û Cavîr Çağlar hatîbun damezrandin. Rêvebirî û berpirsariya wan jî, ji aliyê çend kevnegeneralê artêşa Tirk ve pêk dihat. Ji van kevnegeneralan Teoman Koman miştêşarê Mîlî, Hayrettin Fıstıkoğlu fermandarê Giştîyê Hêzên Nîzami, Vural Beyazıt, Sekreterê Giştîyê Konseya Ewlekariya bû. Ev kes berî aborî, di rêvebirîya leşkerîya Tirk de, di dereca yekemînde wezîfedarbûne.

Tê zanîn ku ew şerê qirêj, yê li Kurdistanê bakur hatîye lidarxistin, bi wan perên aborîyê damezrandîkin. Li vir tîştê bîkalkêş xuya dike: ji berowajî îddîyên rayedarên Tirk, ew şerê li dijî Kurdên bakur hatîye domandin, aborîya dewletê nehatîye nav boranê. Di sala 1999an de dema ser hat rawestandina, tranşîstîyê aborîyê, piştî lêgerînê aborîyê, reformên bingehîn yê aborî destpekkirin. Ew banqên taybetî hatîne tasfiyekirin, hingê aborîya Tirkîyeyê ket nav krîza sala 2001 an. Bi taybetî hetta şer berdeyam-bû, aborîya Tirkîyeyê ne di boranê (krîzê) de bû. Tenê serkaniyên aborîya Kurdistanê bakur hatîbun talankirin, aborîya gelê Kurd serûbin bû.

Bi rastî, ji bo dewleta Tirk, tu sedemê bingehîn nîne ku li dijî dewleta başurê Kurdistanê raweste. Lê, ji bo gelên Kurd gelê sedemên huqûqî, siyasî û exleqî hene ku li dijî dewleta bakurê Qibrisê ya Tirk rawestin.



Ev sedemên taybetî wehane:

- 1- Herema bakurê Qibrisê, bûye wek baregeha „dewleta kûr“ û Terorîzmê, li dijî gelên Kurd tê bikaranîn, aramî û aşîtiyê tehdît dike.
- 2- Aborîya herema bakurê Qibrisê, ji bo ku ji derveyî kontrola sazîyên diravî û bazîrganîya navnetewî de ye, dibe sedema domandina şerê qirêj.
- 3- Herema bakurê Qibrisê, li Tirkîyeyê, sedema desthilatdariya „devleta kûr“ e ji çareserkirina pirsgrêka Kurd û demokratîzêbûna civatê re bûye astengî.
- 4- Dewleta Tirk li nav çavên 25 mîlyon hemwelatîyên xwe yê Kurd dinîhere û li hemberî statûya Kurdistanê başur raweste. Bi dewletên dijîmîne gelên Kurd yê wekî Suriyeyê û Îranê re itîfaqan çedike. Çalakîyên dijî Kurdîyeyê organîze dike. Ji bo van hewildanên dewleta Tirk, ji gelên Kurd re, mafê „miqabele-i-bil misil“ derdikeve holê.

Jinekolog, mêrekolog, dînekolog Prof. Doc. Dr.

Fatê Were Civatê




Şêxbat

Selamunaleykum xaltika Fatê! Tu derdê me Kurdan zanî, halê me bûye halê helawçiya, çiryaye û diryaye! Hinek li zirnê dixin, hinek li daholê! Hinek dibêjin Demokratîk Cumhuriyet, hinek dibên naloo, wehh! Hinek dibên Yekîtiya Ewropa, hinek dibên himmm! Hinek dibên Kendal Zana baş kir, hinek dibên de here looo! Ê yabo ev hemi ne besbûn îcar Leyloka avlêgeryayî çî ji me dixwaze hêêê?! Ez û hevalê xwe şert dîkin. Ez dibêjim Leylo xizmetkara dewleta kûr e, hevalê min dibê naaa, xizmetkara Evdo ye! Ez dibêjim herdû jî peyane lê Leylo gavekê li pêş e, ew dibê naaa! De xaltika Fatê, toplêketê, de ka îcar tu bêje!...

Ehmed Seîd / Hamburg

Hay hooo, hay hooo! Ezê çî xweliyê li serê xwekim yabo i ihii! Lao van Kurda ez teqandim yahoo! Bavêmino, ha kum li serî ha serî li kum, ha gavekê li pêş ha yekê li paş, ma herdû jî ne xiltê qulekê ne xwedê jê razî! Dewleta kûr medenî bûye, Ewropî bûye, berê heq didin jinê û wê gavekê didin pêş bavêmino! Hûn jî hinekî medenî bibin û bihêlin Leylokê bi miradê xwe şabibe û lotka bide xwe ma dinya xiradibe loo! Yek ji hundur îdare dike yek ji derve, herdû jî girêdayî ne, lê siwarê hespê rewan xuyaye, Kemaloooo!! Lê a baş hûn dîsa jî bi a xaltika xwe Fatê bikin. Zarê bavêjin, kê ji we duşê anî ew rast dibêje!!



Xaltika Fatê, te serê min xwarê, ma xune derdê min wek ê tu kesî ye! Ez li Peyama Kurd dixebitim, ev rojname wek toqa naletê ketiye stuyê min. Devjêberdim hetiketiye, devjêbernedim hetiketiya herî mezintir e, ez mame halekî heyirî! Te go çima? Ez derengî şevê diçim malê, derî bi tirs vedikim, ji tirsî jina xwe lempê jî pênxim, wek dizekî bêhna xwe diçikim û bi dizî dikevî nav livînê. Ne rojek, ne duroj, ne sêroj. Carna gava ez derî vedikim, dar, sênî û şekal li nav serê min dikevî allakwekîl. Gava ez li ser compyûterê me jî hişê min li ser tirs û lédana êvarî ye, ez rebenê xwedê çî bikim?

Ji tirsan navê xwe nabêjim! / Bonn

Xaltî bi qurban, te ez qutifandim laoo! Ê te dar û şekal li serê te dikevî lê ê min mêrê min bi kêr û xinceran dihat pêşya min. Taliya talî min debar nekîr û ez revyam û min jî wek Aysel Malqaçê xwe veşart. Piştî min operasyona estetîkê kir û min wek Kesîre Yildirim xanim nasnama xwe guhert û veşartî mam. Îcar lawkê mino, tu jî her xwe bavêj tor û bextê komela mafê mêran û li wir iltica bike. Yan jî, tu jî wek Huseyîn Yildirim nasnama xwe biguhere û her li Kenyayê xwe veşêre. Te nerî go ew jî nebû, îcar bi riya internetê vîrûsekê Kemalî ji jina xwe re bişîne ji bo ku wek rewşenbîrên me hew karibe ji ber internetê rabe û li te nexê. Îsa û Mihemed li piştî te bin!

fate@peyama-kurd.com

Super dewlet

Li Nisêbinê Kuk çî û Kawaçiyên me niqaşa emperyalîzmê dîkin. Yek ji vir û yek ji wir radibin hev, pelq û hey pelq li hev dixin. Ferman li bajarê Nisêbinê radibe. Kuk çî li Kawaçiyên digerin û Kawaçî li Kukçiyên digerin. Kê kê bigirta mala wî xerab dibû.

Guro û Silêmano jî Kawaçî bûn. Herduwa lîxistînek baş ji destê Kukçiyên xwaribûn. Welhasil şer radiweste. Ji herdû aliyên jî hinek tîr girtin. Dadgeh li wan vedibe

lê kes xwe neheq nake, herdû alî hevdu sîcdar dîkin. Radibin şemo jî wek şahid tînin dadgehê. şemo dilxwazê Kawaçiya ye.

Dadgêr jî şemo dipirse:

- Bêje kurê min, sîcê kê ye? şemo jî dibê:

- Hakim beg; ez bi serê bavê te kim, ne ew in û ne jî ev in. Sîc sîcê herdû super dewleta ye. Ez herdû super dewletan nasnakim, nizanim bê kurê kê ne lê vana berdî û wana bigrin.....

Bersivên hejmeta 16an

Çeperast

1) Qelûn / abadîn 2) Onan / alozî 3) Nêçîrvan / zah 4) Êl / ti / nûr / wa 5) Bîranîn / êlew 6) Efû / cî / ece 7) Ūdî / ew 8) Arî / karmend 9) Ezûyarê / îna 10) Naçarî / ardil 11) Diravî / la 12) Hekîm / sitran

Serejêr

1) Qînêber / en 2) Êlîf / azade 3) Loç / rû û rûçik 4) Ūnîta / dîyarî 5) Narincî / aram 6) Nv / î / krîv 7) Ann / naê / îs 8) Banû / 9) Al / rê / emîrat 10) Doz / lewend 11) Îzawec / naîla 12) Nîhawend / lan

Remildank



Beran (21.03-20.04)

Hûn ji acizî û tengasiyê xilas dibin. Kirinên xwe li bêjîngê xî, xwe bipîvin, xwe zelal bikin.



Gamêş (21.04-20.05)

Pirsgirêkên xwe ji herkesî re nebêjin. Dost hene, dijmin hene. Berî herkesî li xwe bifikirin.



Cêwî (21.05-21.06)

Li ser projeyên xwe rawestin. Hinek nûçe karin we têxin heyecanê. Erênî bin, bê hêvi nemînin.



Kevjal (22.06-22.07)

Pirsgirêkên navmalbatî mezin nekin. Di bin bandora hissên xwe de nemînin, ruhtenik nebin.



Şêr (23.07-22.08)

Hinek bûyer bandorê li we dîkin. Xwestekên we zêde dibin. Radestî bûyeran nebin, bi aram bin.



Simbil (23.08-22.09)

Di aborê de nişanên erênî dixuyin. Hûn di bin bandora teknoloji û nûjeniyê de dimînin.



Mêzên (23.09-22.10)

Hûn vê heftê kêfşa ne. Enerjiya we zêde ye. Bi hêrs nebin, hinek terz û adetên xwe biguherin.



Dûpişk (23.10-21.11)

Hûn berpîrsiyariya xwe zanin. Berî go hûn li ser projeyekê serê xwe bêşînin, baş bifikirin.



Kevan (22.11-21.12)

Di warê aborî de pêşketinên baş dixuyin. Radestî xwestekên xwe nebin, bi hemd bilivin.



Kovî (22.12-19.01)

Têkiliyên xwe û dost û xwediyan xwe xiranekin. Nûçeyên dûriyê hene, rêwîti dixuye.



Satil (20.01-18.02)

His û zîzbûna we zêde dibe. Bala xwe bidin kar û mala xwe. Xwîngerm nebin, berfireh bin.



Masî (19.02-20.03)

Hûn afirmand in, lê lingên xwe zêde dirêj nekin. Çavê derûdorê li ser we ye. Haydarê xwe bin.

Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

ÇEPERAST

1. Dewlemend, xwedî pare 2. Belengaz, feqîr, zeif / ji bastêq û qûzan çêdibe 3. Keda heram, parê belaş / li ser nan çêdibe / xwarin û vexwarina roj, hefte, meh an salekê, 4. Kevnedewletek Kurd / maddeya nava çayê / hevgerêdanek 5. Êvara îdê, leyleqêdir / generalê deryayê 6. Du tîp / wezîfe, kar / cin, pîrebok 7. Serleşkerê tevayî / du tîp 8. Gêjî, serêşî / kesê ji fransayê be 9. Li Swîsreyê navê çemekî / reqeh, parçe / kurtevinîsa alîgirên tevgera Libyayê 10. Tirhik, zîl / di santrancê de lîztikek / tela qalinda tembûrê (paşûpê) 11. Qewitî, şîret, agahdari (paşûpê) / fermana veşerê, neçê, bizîvîre 12. Zehmetî, zorî, giranî / mêr, leşker, mêrxas

SEREJÊR

1. Dewlemendî, maldarî 2. Li Swîsreyê çemek / bernavê xwedayekî Sumeran / du tîp 3. Başî, çeyî, qencî / bi ewr ve girêdayî, ewrî 4. Yek, yekane, ne cot / navê balafirek şer 5. Zîl, fidan / devjêberdan, jêqerîn / av xwestin, ne birçî lê...6. Zagon, qanûn / heqnenas, zalim 7. Bê biryar, ne zelal / paytextê Împ. Asûr 8. Paytextê welatê Perû / pine, parçe 9. Bûyere xwezayî, hewa (paşûpê) / navekî mêran (paşûpê) / gişt, hemû, tev 10. Kûsiyê avî / nameya rojê, weşana rojê 11. Navekî jinan / kozîk, ciyê starê 12. Satila piçûk, dewla hesinî / Navekî jinan, jina spehî

Bersîva testa evînê bidin!



Gelo dereceya eşqê heye? Başê ev li gora çi tê eşkere kirin?

Em bawerin ku hûn geleki miraq di-kin ka ew kesê bi we re ye çiqasî ji we hez dike. Lê hûn çiqasî aşiq in? Bersîva tekstê bidin û rewşa xwe fêr bibin.

1. Tê bîra we ku cara yekemîn hûn bi hevdû re çûn kuderê? Başê wê rojê çi li xwe kiribû, di bîra we deye?

- Tam ne di bîra min deye
- Divê ez piçekî bifikirim
- Ji hişê min derketiye?
- Ev ne girîng e.

2. We guherandinek di xwe de çêkir (şiklê por, cilên nû hwd.) lê wî ferq nekir. Wê reaksiyona we çawa be?

- Ezê bîponijim
- Ezê li berkevim, lê xuya nakim
- Ezê bidim rûyê wî
- Bi mehan ez pê re napeyivim.

3. Bi hevalên xwe re bû û piçekî dereng hat civanê xwe. Hûnê çi bêjin?

- Şeva te çawa derbas bû?
- Ê, hevqasî jî nabe
- Tu min dixapîni
- Ez te terk dikim

4. Gava hûn li aşxanekê rûdinin hezkiriya wî ya berê hat. Hevalê we nerehet bû. Hûnê çi bifikirin?

- Ev reaksiyonek geleki normal e
- Gelo ew hûn jî bîr nekiriye?
- Ezê hesabê vê bipirsim
- Hema di cî de ezê rabim û biçim.

5. Plana ku we ji bo dawîya heftê çêkiribû lê wî got ku „Karekî min bi lez derket“ û betal kir. Niha wê çi bibe?

- Ezê ji bi qedera xwe razî bibim
- Gelo yeka din heye?
- Dawîya wê heftê geleki rezîl dibe
- Ezê bê wî programa xwe bidomînim

6. We bi malbata wî re hevdû naskir, lê cudatîyên we yên kulturî hene. Ji we bê hûnê çi bikin?

- Ezê her hurmet nîşan bidim
- Ji ber kêçê lihêfê naşewitînim
- Ez bi malbata wî re qet hevdîtînan nakim
- Pêwendiyên me wê kesîn biqetin

7. Ji kar hat avêtin. Êdî perê we geleki kême. Ji bo kêfê hûn nikarin pera

veqetînin. Pêwendiyên we wê çawa tesîr bibîne?

- Di rojên çê û xirab de em bi hevdûre ne
- Bê guman emê pê piçekî biêşin
- Neşadbûna me kesîn e
- Bê pere evîn nabe

8. Di rojbûna we de diyariyek bê dilê we kirî. Hûnê çawa ji wî re eşkere bikin ku diyarî li xweşiya we neçû?

- Ez eşkere nakim, bibîranîna wî bes e
- Ezê deynim aliyekî û pê re eleqeder nabim
- Ma te ev layiqî min dît?
- Tu vê diyariya xwe li serê xwe bide!

9. Ji ber sedemekê bi rojane ku xemgîn e. Depresyon derbas dike. Hûnê çawa alikariya wî bikin?

- Pêwîst be ezê ji bi wî re bigirim
- Ezê wî di halê xwe de bihêlim
- Ezê bêjim, „Ê, te jî geleki dirêj kir!“
- Derdê herkesî ji xwe re

10. Ji ber sedemek vit û vala pevçûn derket. Piştê we fêmkir ku şaşî ji we ye. Erê?

- Hema ezê lêborîna xwe bixwazim û li hevdû bêm
- Ezê hewl bidim ku hewayê nerm bikim
- Ezê li bendî bim ku gava yekem ew bavêje
- Ez qet şaşîyan nakim!

Encam Eger “a” pirbin:

Di vê dinyê de kesek ji we bêtir hez dike nîne. We xwe fedayî evîndarê xwe kiriye. Wek “Periya bextewariyê” hûn tenê bextewariya wî dixwazin. Ji ber vê hûn jî bextewar in. Kesê ku hûn jê hez dikin bi rastî jî bi şans e.

Eger “b” pirbin:

Hûn evîndarin lê bi şik in jî. Her di serê we de pîrsa, “Qandî ku ez ji wî hez dikim gelo ew jî ji min hez dike?” heye. Û hûn nikarin bersîvek zelal ji bibînin. Ewqasî bi şikbûn dikare zirarê bide aqilê we.

Eger “c” pirbin:

Egoîzm di xwîna we de heye. Hûn ewqasî heyranê xwe ne ku ji bo hezkirina hevalê xwe wexta we namîne. Eleqeyên we bi xêra wî dimeşe. Bi rastî ew bêtir ji we hez dike. Lazime hûn xwe piçekî dibêr çav re derbas bikin yan na hûn dikarin wî wînda bikin.

Eger “d” pirbin:

Evîn û hûn qet nikarin ligel hevdû bin. Ger mimkun be ji mêran bi dût kevin. Ger hûn bi kê re bin hûnê tenê zirarê bidin. Ji bo tenduristîya mirovan jî divê hûn li derekê bîn girtin.



Çavên evîndar qisûrê nabîne!

Bi zanyarî hat îspat kirin ku “Çavên evîndar kor e!”

Hat tespît kirin ku hestên evînî dibe sebebê pestandina çalakiyên beşên mejî yên ku ramana rexnegirî kontrol dike. Li gora encamên rapora zanyarên University College London ku di kovara NeuroImage de hatiye weşandin, him evîna (eşq) romantîk û him jî evîna dayikê ya zarokê xwe di mejiyê însên de eynî bandorê dike.

Evîn, beşê ku di mejî de nirxandina civakî dike dipeştîne û mirov ji hestên negatîv bi dût dixê. Dema mirov evîndar



dibe çalakiyên vî beşî kême dibin.

9 xalên ji bo hizûra însên

Li gora tespîtên kovara „The Journal of Happiness Studies“ 9 rêzikên ku mirov digihînin bextewariyê wiha bi rêz dibin.

- Xuyana xwe ya derve bi ya kesî re raberî hev nekin.
- Hirsên xwe bê kontrol nehêlin. Her ku hûn hêrs dikevin bêbextiya we zêde dibe.
- Pereyê ku qandî debariyê bike bes e. Pereyê pir bextewariyê zêde dike lê ne geleki.
- Li ber nekevin ku hûn ne dahî ne. Li gor lêkolînan zekaya zêde jî bextewariyê bi xwe re nîne.
- Bextewarî piçekî jî genetîk e. Hin mirov bi awayekî genetîk bêtir meyildarî bextewariyê ne.
- Mirovên zewicî ji azêban (ne zewicî) bêtir tatmîn dibin.
- Baweriya bi Xwedê û دنیا wî alî, mane û armançê dide jiyane. Hestên tenêbûnê wînda dike.
- Ne egoist bin. Tiştên di destê we de heye bidin derdora xwe.
- Dev ji zerafetê bernedin, dilê însên nehêlin.



Julia Roberts, hîna jî stêrka herî biha ya Hollywoodê ye

Ev stêrka 37 salî ya beriya demekê bû dayika dû zarokên cewî, serê her filmê ku çêdike 20 milyon dolar distîne. Li gora kovara salane ya bi navê Hollywood Reporter, piştî

Roberts, Cameron Diaz tê. Stêrka Awistralî Nikol Kidman ya ku bi gewrbûna xwe bi navê denge, di rêza sêyemîn de ye û ew jî kêmi 15 milyon dolaran dernakeve pêşberî kamêra. Xwedîya Oscara sala 2002 an Halle Berry bi 14 milyon dolar, Sandra Bullock, Jennifer Lopez û Angelina Jolie jî bi




ناهنگی شەوی سەری ساڵ لە هەولێر



هەولێر / نامق - سلێمان - شەوی ۲۰۰۴/۱۲/۳۱ لەسەر ۲۰۰۴/۱/۱ لەیانە ئاوێزە خێزانی هەولێری پایتەختی هەریمی کوردستان، ناهنگی سەری ساڵی لە باوەشگرت و ساڵی نوێی ۲۰۰۵ی لە خەلکی کوردستان و دۆست و برادەران پیرۆزکرد. ئەمەش بە ئامادەبوونی ژمارەیهکی بەرچاوی خێزانهکانی نیو شاری هەولێر و بە بەشداری هونەرمندان (چۆپی و قادر ئەسەد و بەنگین) بەرپۆچوو و ناهنگەکه لە کاتژمێر ۸.۳۰ی شەو بە کاتی کوردستان تا کاتژمێر ۱ی نیو شەو بەردەوام بوو و ژمارەیهکی زۆر لە میوانانی کورد و عەزەب بەشداری ناهنگەکه بوون. ئەمە وێرای چەندین رۆشنگیری کورد لە دەرەوە و ناوێر ئامادەبوون، لەواتەش خێزانی هونەرمندی گۆرە (حەسەن زێرە) بوو. خەلکی ئامادەبوو زۆر خوشحەل بوون ناهنگەکهش راستەوخۆ لە سەتلایتی کوردستان پەخشکرا و بێنەرانی ناو و دەرەوەش بە پەيوەندیکردن و بێنەرانی زۆر خوشحەل بوون بەوێی لە کوردستان ناهنگ سازدەکریت که نیشانهی مەدەنییەت و هێمنی و ئاسایشە.

فرۆکهیهکی سیخوری تەنانهت وێنە هەلمی قاوش دەگرت!

توانای فرینی بەردەوامی بۆ ماوهی ۱۵ کاتژمێر بە دوو گالۆن سووتەمەنی هەیه. پنیوستی بە دەربەندی فرین نییه و کارەکانی پرۆگرامکراوه و بە سیستمی GPS کاردەکات، وێنە فۆتۆگرافی و قیدی زیندو راستەوخۆ بۆ کۆمپیوتەری دەستی هەلگیراوه دهنیزیت، وێنەکانی بەجۆریک ورد و روون که لە کۆپیک قاوشی گەرما وێنە هەلمەکه دەبنیزیت، بەرهمهتانی یەک فرۆکهی لەم جۆرەش ۱۰۰۰۰ دۆلاری ئەمریکیه. فرۆکهیهکی لەم جۆرە بە تەکنۆلۆژیای ئاییندی چەنگی دادەنیزیت، که هەلەسەتیت بە هەموو ئەو ئۆپەراسیۆنە رۆتینیانی که پنیوست بە فرۆکهوانی زیندو ئەکات. بێرۆکهی ئەم فرۆکه نوێیهش لەو فرۆکانه هاتووه که بۆ کۆکردنەوهی زانیاری ئاو هەوا دروستکراون و لە ئۆقیانوسی ئارامدا بەکاردههێنن.



سوپای ئەمریکا لە عێراق فرۆکهیهکی سیخوری خسته بۆاری خزمەتکردنەوه، ئەم فرۆکهیه بێفرۆکهوانه و تا ئێستا زانیاری زیاتر له ۱۰۰۰ کاتژمێری بۆ بەرژوهەندی هێزەکانی پیاوهی ئەمریکا کۆکردۆتەوه. ئەم فرۆکه نوێیه ناوی **scaneagal** ه واته هەلۆی سڕینەوه درۆییهکهی ۴ پی دەبیت و پانی بەلەکانی ۱۰ پی دەبیت.

جل و بەرگ و کەسایەتی مندال



چەند جوانە مندالەکهت پۆشاکێ له بەریکات و ریکوپیکی دەرێکهوێت، جوانتر ئەوهیه فیزی بکەیت خۆی خۆی بگۆریت و گرنگی بە جل و بەرگی بدات و ریکوپیکی رەنگەکانی هەلبژێریت، چونکه ئەم ریکخستنه تەنها بەرزکردنەوهی زهوقی مندالەکه نییه بەلکو کەسایەتیشی پەرەپێدەدات. پۆشاکێ مندالەکهت بەشیکه له دیمەنی دەرەکی که دەوروبەری لهوه زۆر تێدەگەن. هەرچەندە مندالەکهت تەمەنی ۲یان ۴ ساله لای تۆ وایه که ئەو ناتوانیت جلوبەرگی خۆی دیاریبکات. بەلام له پێدا دەبینی که توانای ئەو جۆریکی

دیکهیه و خۆی داوایهکات که ئەو پانتۆله یان ئەو کراسه له بەریکات، له بۆنهیهکدا که بەلای ئەوهوه گرنگه، بۆ ئەوهی مندالەکهت بزانن جل و بەرگ هەلبژێریت، دەبی سنی شت بەخهیتە بەردەستی تاخۆی به گۆرێکی ریکخستنی رەنگەکان هەلبژێرێت و ریکوپیکی.

ساڵی ۲۰۰۴ بۆ شانۆکانی برودوای سالتیکی پر سوود بوو

مەهدی جاف - سوید - داھاتی شانۆکانی برودوای لە شاری نیویۆرک لە ساڵی ۲۰۰۴ دا ۷۴.۸.۹ ملیۆن دۆلار بوو، لە ساڵی ۲۰۰۳ دا ۷۲.۵ ملیۆن دۆلار بووه. بە گۆیژەیی هەوالهکانی ئاسوشید پریس بێنەرانی شانۆکانی برودوای لە شاری نیویۆرک لە ولاتە یەکگرتووهکانی ئەمەریکا لە ساڵی ۲۰۰۳ دا ۱۱.۳ ملیۆن و لە ساڵی ۲۰۰۴ دا ۱۱.۹ ملیۆن بێنەر بووه. یەکیک لەو شانۆگەریانیە که داھاتی زۆر بووه شانۆگەری:

Sundays 700
ئەوهی شایانی باسه که بەهای هەر پسونهیهکی ئەم شانۆگەرییه کهیه نزیکهی ۱۰۱.۲۵ دۆلار. لە شانۆگەریه دیارەکانی برودوای که لەم سالدا پیشکەش کراون وەک:

Wicked Avenue
A Raisin in the Sun

خانمە ئەکتەریک یارمەتی بۆ لێقهوماوانی لافاو دەنیزیت



مەهدی جاف - سوید - ساندرای بۆلۆک خانمە ئەکتەری 40 ساله یەک ملیۆن دۆلار له ریکای خاچی سوورهوه بۆ لێقهوماوانی کارەساتی لافاوی دەریا له ئاسیا دەنیزیت ..

ساندرای بۆلۆک له ریکای فیلماکانی وەک:
Speed
While you were sleeping
Miss Congeniality

ناسراوه .. ئەوهی شایانی باسه که ئەم خانمە ئەکتەرە لێشتر له یەک ملیۆن دۆلاری بۆ یارمەتیدانی یازدە سیلته مەبەری **World Trade Center** له ئەمەریکا بەخشی.

بە کوردی بدوێ،
بە کوردی بخوێنه،
بە کوردی بنووسه،
بە کوردی
بیربکەرەوه!

بە یامی
کورد نامادە
بلاوکردنەوهی
ریکلامە ی بازگانی و
بروسکە ی پیرۆزبایی
و پرسەنامە بەنرخیکی
گونجاوه

ناسا بنکهیهکی ناسمانی له "کاینج" دهکاتوه!!!



نزار جاف
هەر دوا بەدوای فرینە "موجیزه ناساکە"ی ئەو کچەیی که له هەولێر هوه بەرهو مەککه فری، هەموو ئازانسە ئاسمانییهکان سەریان سوپما و کەوتتە دواي ئەو هەواله سەیر و سەمەرە. بەهۆی ئەوهش که ئازانسی نیو دەولەتی گەردوونی ناسا له هەموو هاوتاکانی بالادەست تره، نوێنەری ناسا بە ئازانسەکانی هەوالی راکەباند که ناسا به نیازه گوندی "کاینج" له هەولێر بکریت له بەرامبەر نرخیکی خەیاڵیدا! هەر هههه گوتی که له سالانی رابردوودا ملیارها دۆلار خەرج کراوه بۆ هەلدانی مانگە دەستکردەکان بۆ بۆشایی، سەرباری ئەوهی که هەموو موشەک هەلدانیک بڕیک پارەیی زۆری تێدەچیت و زۆر جاریش ئەگەری نۆشوستی ئەو هەلدانە له ئارادا هەیه، بەلام خوشبەختانه به هۆی ئەو تەکنۆلۆژیای نوێیه نەدی و نه بیستراوهی که له گوندی "کاینج" هاتۆتە ئاراه، ئیدی ناسا پنیوستی بە دروستکردنی موشەک و بنکهی هەلدانی موشەک نییه و راستەوخۆ سوود له تەکنۆلۆژیای مرۆیی وەردهگیریت. نوێنەری ناسا له درۆیە راکەباندنەکهیدا گوتی: ناسا به نیازه هەموو بنکه ئاسمانییهکانی تیک و پیک بدات و تەنها بایهخ بهو بنکه ئاسمانییه بدات که له گوندی "کاینج" دروستی دەکات و ئاشکراشی کرد که تەنها گرفتیک له بەردەم ئەم پرۆژه میژوووییە ناسا مەسەلهی نووسینی "نوشته و نزا" یه، چونکه هیچ جۆره زانیارییهکی ئەوتویان نییه له و بارهیهوه. نوێنەری ناسا روونی کردەوه که لەم سەرکەوتتە مەزنەیی مرۆفی هەزارەیی سینه مەدا پنیوستیش به خۆراک و خواردنەوه نییه بۆ مرۆقه موشهکییهکانی کاینج، نوێنەری ناسا له لایهکی دیکهیدا گوتی ئیمه لامان سەیر نییه لهو گوندەدا مرۆف بفریت چونکه گۆزی "ئەسحابه رهش" که له هەمان گوندە درۆییهکهی ۱۰ بۆ ۱۵ مەتره، مردویەک بهم درۆییه سەیر نەبیت ئەوا فرینی کچیکیش هەرگیز سەیر نییه!


نێوانسی توریستی
NEW PLAN
نێه نامادە ی خزمەت کردنی هاوڵاتیانی کوردی عێراقین
کوردستان له ریکای تاران هوه
فیزیای ئێران له ماوهی دوو ههفتهدا
له گەل هەر بلیتیکی دووسهههه تاران، مەودای خواردن له شیکترین رێستوران له تاران به مۆزیک زیندوو
Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E-Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de
بایت بۆ سەرئاسەری جیهان
بۆ سەرئاسەری جیهان
تاران له ۲۲۰ گره

Heyama Nû

Hin notên xwendina romaneke nû Jar lê Sermest û Lokman Ayebe

-|-

Îbrahîm Seydo
Aydogan



Sermestê ku lehengê romanê yê sereke ye, ji ber ku hevalê xwe yê ku pê re ketiye peywendiyê cinsî kuştîye, xwe sêdar his dike. Hevalê wî, Jar, bi hestên homoseksuelî nêzîkî wî bûye û Sermest jî ji ber ku pê re ketiye vê têkiliyê, ji ber xwe fedî kiriye, bi xwe re ketiye navkokiye û jar xistiye nava xwarina hevalê xwe. Kesek nizane ku Jar ji aliyê Sermest ve hatiye kuştin. Lê belê Sermestê ku hezkiriyê xwe kuştîye, nikare bi barê kuştina hevalê xwe bijî û diçe xwe dîkujê.

Di vê romana ku Lokman Ayebe di sêzdeh rojan de nivîsandiye de, gelek hêlên pênuşeke ciwan lê li gora ciwaniya xwe xurt xwe didin der. Ji ber ku berhema vê pênuşê ya yekem e, divê mirov bizane ku asayî ye ku hin kêmaniyên zimanê wêjeyî tê de hebin; lê belê nivîskêr bi rêvebirina bûyera xwe ve, bi hûnandina berhema xwe ve, bi xwendevanên xwe dide hîskirin ku ev pênuş dê romanên xurt binivîsîne.

Jar lê Sermest, bi kabûseke Sermest ya tevlihev dest pê dike ku dûri bûyerên romanên kurdî yên ku em fêrî wan bûne ye. Motîfên surrealîst di şayesa vê kabûsê de hevdu temam dikin û bandore xwe li dewama romanê bi giştî dikin. Di temamê bûyerên romanê de ku di pênc rojan de derbas dibin, em ê Sermest û eşên wî bi heman şewazê nas bikin. Nivîskêr bi vî awayî xwendevanê xwe amadeyî atmosfera romanê ya tarî û kafkaesk dike. Mikurhatin û veşartina tercîh û tendansên cinsî di nava romanê de li bajarekî post-modern ku dişibe bajarên kurdan navkokiye tûnd di nava lehengan de peyda dike. Hilbijartina cihên bûyeran bêtir weke deverên xalî û bêtir tarî, şev, odayên piçûk, barana şevê û mija qalind e. Bi tenêti xwe di nava hemû rûpelên romanê re dide der. Qey ji ber wê ye ku di nava şayesên doraliya derve re, di 40 rûpelan de, em pênc caran dibînin ku hezkirî bi destê hevdu digirin. Ev hêla romanê ji bo nivîskêr weke hûrgiliyê balkêş berbiçav dibe ku tim dubare bûye.

Yek ji giringiyên vê romanê ew e ku ev roman xwendinên romanên kurdî yên berê aciz dike û xwe ji aliyê bûyeran ve jî ji wan bi dîr ve dixîne. Ew herweha bi tercîha xwe ya mijar û lehengên xwe ve jî hişmendîya civatê ya kevnare dihejîne. Kesayetiya Sermest du navkokiye dema me temsîl dike ku herdu jî bi hevdu

re têkildar in. Ya yekem, cihê homoseksuelan di civata me de ku bi xwe trajediyek e; ya duyem jî navkokiye kesên xwedî tercîhên cuda ya di nava wan bi xwe de.

Sermestê ku bi têkiliya xwe ya bi hevalê xwe re li tendansên xwe yên cinsî û bîseksueliya xwe hay dibe, naxwaze vê yekê bipejirîne. Pejirandina vê rastiyê, ji

bo wî ne hêsan e. Ji ber ku ew weha fêr bûye. Civaka ku ew bi axlaq û hişmendîya wê ve mezin bûye, terbiyeyê mêrantiyê daye giyanê wî. Nivîskêr bi xwe jî di vegotina vê têkiliyê de şewazeke ecêbmayî bi kartine ku em marjînaliya vê sahneyê li gora civata wî baştir dibînin.

“Nizanîbûn çawa tavilê du kesên mêr tazî ketibûn pêxîla hev”. (r.100)

Ev nakokiya ku ji perwerdehiya civakê tê, wî di romanê de ber bi kuştina hevalê wî ve û bi dîr re jî ber bi xwekuştinê ve diajo ku xwendevan di nava monologên Sermest yên ku baş hatine avakirin re dişopîne.

Monologên leheng û vegotina vebêjêr bi awayekî weha li hev hatiye siwarkirin ku mirov sedema wê jî baş fahm dike. Di gelek romanên kurdî de hin awayên vegotinê yên weha hatine bikaranîn. Lê di vê romanê de mirov bi hêsanî tê digihîje ku ne ji monologên Sermest be, biryara wî ya xwekuştinê û sedemên wê yên berî destpêka romanê de neyên fahmkirin. Nivîskêr herweha ji derfetên vegotina romanesk jî bi vî awayî destkewtî bûye û wan di berhema xwe de baş bi cih dike ku weke hin romanên kurdî yên din pîneyan neynin bira mirov.

Di nava vê teknîka vegotinê de, hin cih hene ku diviya nivîskêr hebekî din jî bêhna xwe bi demê re fireh bikiraya. Di navbera r.53 û r.60 de sê caran bûyer û mekân ji hevdu qut dibin ku sedema wê jî kurtbûna dema nivîsandina wê ye. Ev qutbûyin ji ber ku xeta herikîna romanê diguherînin, weke kêmaniyên teknîkî dikarin bêne nixrandin. Sêzdeh roj tucarî têra nivîsandina romaneke têkûz nakin. Heman qutbûyina bûyerê di r.82 de jî heye. Lê dîsa jî ji ber ku romana wî ya yekem e, mirov divê di vê hêla berhemdariyê de li sedema van kêmaniyan bigere.

Em ê mijara psikolojiya lehengê wê û mijara bikaranîna zimên ya divê romanê de jî bihêlin nivîsên pêş.

ibrahimseydo@hotmail.com

Radyoya Êrîvanê û xebata wê

Radyoya Êrîvanê di destpêka 1955ê de vebû. Di heman salê de, rojnameya „Riya Teze“ xareke din hate weşandin. Ev yek piştî mirina Stalîn pêk hat. Di dema Stalîn de, zimanê kurdî hate qedexekirin, rojnameya „Riya Teze“ hate girtin û ronakbîrên me ketin zindanan. Piştî mirina Stalîn, bi biryara Polîtbiroyê li Moskoyê sazî û dezgehên yên çanda kurdî hatin damezrandin. Radyoya Êrîvanê di destpêkê de 15 deqe weşandî dikir, piştê bûn 30 deqe. Di sala 1956ê de, bi biryara Polîtbiroyê li Moskoyê weşana radyoyê bû seet û nîvek.

Di wê demê de, min li Êrîvanê dirok dixwend. Wê çaxê, serokê radyoyê Casimê Celîl bû. Ew pîmamê min bû. Ji ber ez ji gund hatibûm û zimanê min ê kurdî paqij bû, Casim ji min xwest ku ez di radyoyê de alîkariya wan bikin û nivîsan wergerînim. Min jê re got ku xwendina min bi ermenî û rusî bû, lê wî got ku ezê fêr bibim. Wan

dikir. Carekê ji me re hate gotin, ku yekî dundî çû ji xwe re radyoyekê bikire, îca ji xwediyê dikanê pirsî, bê ew radyo „Êrîvanê“ dikişîne, yan na.


Me pir kar kir, lê xebata radyoyê di salên dawî de qels bû. Hikumeta Ermenistanê ya nû zêde guh li çanda kurdî nedikir.

Niha dema weşanê hatiye kurtkirin; li şûna seet û nîvekê, tenê niv seetê weşanê dike. Wan niv seet da Êzîdiyan jî. Êzîdiyan xwest ku radyo bi zimanê wan jî weşanê bike. Ez bi xwe ezîdî me. Zimanê ezîdkî nîne. Zimanê kurdî heye. Em tevde bi kurmançî diaxivin. Mixabin wan rewşeke xerab çêkir.

Di Radyoya Êrîvanê de, gelek ronakbîrên me yên hêja kar kirine. Radyoyê gelek karên hêja kirin. Keda me di hişyarkirina gelê me de heye. Radyo tiştêkî bêsinor bû, dijminan nekarî rê li ber bigirin. Dengê me diket her maleke Kurdistan.

Di warê erşivkirinê de, me Fonda

**Ronakbîrê kurd
Wezirê Eşo ji
Ermenistanê di
01.11.2004ê de
bûm 70ê salî.
Ji PEYAMA
KURD re ew li ser
xwe û xebata Radyo-
ya Êrîvanê axivî.
Em gotinên wî li
vê derê diweşînin**



carê çend rûpel didan min û min ew dikirin kurdî. Wilo ez bi radyoyê ve hatin girêdan. Nivîs ji me re ji Moskoyê dihatin û me ew ji rusî diwergerandin kurdî û di radyoyê de diweşandin. Herweha me di radyoyê de şano jî çêdikirin. Me ji wan re digot „radyo komposîsyen“. Ez heta dawîya sala 1994ê di radyoyê de mam. Jiyana min bi piranî bi radyoyê ve girêdayî bû. Ew bûbû weke mala min. Hin roj hebûn, min ta 20 rûpel diwergerandin kurdî. Ji bilî wan me nûçe û şiroveyên xwe diweşandin.

Di salên dawî de Ermenistanê bû serbixwe û azadiya nerîne çêbû û me Tirkî jî rexne dikir. Berê, Mosko ev yek nedihîşt. Me dora 30 şirove li ser serhildanên kurdî çêkirin.

Bawer bike, axavtinên me yên di radyoyê de li hemî beşên Kurdistanê dihatin guhdarkirin, bi taybetî li Kurdistanê Bakur. Xelkê jî ji me re digot ku wan li me guhdar

Muzîka Kurdî çêkir. Bêtirî 3000 stran û kilamên kurdî hatine qeydkirin, winda nabin. Kes nikare destê xwe bide wan. Kilamên kesên mezin mîna Üeroyê Biro, Üêx Üamilê Beko, Egîdê Cimo hatine qeydkirin. Em dixwazin wan bibin Kurdistanê, lê pere lazim in.

Ta niha pênc pirtûkên min hatine çapkirin. Ez hinên din amade dikim. Ez bêtir çîrok û kurteromanan dinivîsînim. Gelek tişt di nav destên min de ne. Ez herweha biranînên xwe amade dikim. Li ser Qenatê Kurdo, Dîroka Kurdên Sovyetê, Üivan Perwer ez pirtûkan amade dikim. Wekî din, ez dixwazim sefernameyekê li ser çûna xwe ya Kurdistanê binivîsînim. Cara yekê bû ku ez çûm min welatê xwe dît.

Kar pir heye. Eger Xwedê çend salên din jiyane bide min, ezê wan pêk bînim.

Amadekirin: Sîrwan Hecî Berko

Arjen Arî û Mihemed Bîlan

"Kurd dikarin festêvalên baştir çêkin"

Mehmed Eren: *Gelo di vê festîvalê de rewşa harmonî û cûdatiya muzîka Kurdî çawa bû? Meriv çawa bêje, muzîka Kurdî dewlêmanî e?*

Arjen Arî: Gava ez wek şairek ku tekiliyek di navbera helbest û muzîkê de heye. Ya ku min li wir di, muzîka serdest ya Kurdî, ya Rojhilatê Kurdistanê. Muzîka Kurdî Iranê he bêtir min xemgîn dike, dixwazim wek mirovek muzikhez guhdarîkim.

